


Serokê HADEP'a Stenbolê Av. Mahmut Şakar:

## Dewlet li pey heyfa têkçûna xwe ye



**L**ê pêvajoya ku gelê kurd îro tê de ye, ne pêvajoyeke ji rêzê ye. Pêvajoya hebûn û tunebunê ye. Giringî, dîrokîbun û neteweyîbûnê di nava xwe de dihewîne. Sedema êrîşen li ser me bi vê yekê ve girêdahî ye.

Polîtikaya fermî ya li ser HADEP'ê diyar e. Pişî ku partî girtin, li serê dewletê bû bela, dewletê dest ji vê rîbazê kişand. Niha dixwaze kelehê ji navê vegire û bi dest bixe. Doz û daxwaza teslîmiyetê hate kirin. Her wiha xwestin rola "İdiris-î Bitlisî" bi me bidin lîstin.


Ev sîstem, îro kurdên di nav sînorên xwe de û partiya wan HADEP'ê wekî dîl û rehîne dibîne. Li hemberî geşbûna PKK'ê dîn û har bûye. Lewre ji dixwaze êrîşan bibe ser van rehîneyan û tola têkçûna xwe hilîne. (R.8-9)

Ji ber qeyrana aborî,

## PİŞESAZIYA TIRKIYEYÊ TOP AVÊT

■ Tirkîye jî para xwe ji qeyrana aborî digire û heta niha gelek febrîqe hatin girtin, 45 hezar karker ji kar hatin avêtin. Lê belê qeyrana li Tirkiyeyê ne bi qeyrana derve ve girêdayî ye. Li Kurdistanê ji aliyê aborî ve dewleta tirk gelekî tengijandiye. Dewleta tirk di sala 1994'an bi tenê bo şer 400 trilyon xerc kiriye. Di salên dawîn de qerza hundûrîn ji 4.2 katrilyonî derketiye 10.2 katrilyonî. (R.3)





SAMİ TAN

Hinek kes îdia dikan ku weşana bi zimanê kurdî ne qedexe ye. Lê êrîşen li ser saziyên ku li ser zimanê kurdî xebatê dikan, van gotinan pûc dikan.

P iştî ku kêseya kurd kete rojeva cihanê û hinek bîryar ji hêla Parlamento Ewrûpayê ve hatin girtin, aqilmendên dewletê ketin nava keft û leftekê. Digel gili û gazinê ji Yekîtiya Ewrûpayê, nîqaşen li ser nasnavê kurdan û taybiya zimanê kurdî jî dest pê kir.

Di nava kurdan de gotinek heye, dibêjin: "Teriya kerê ye, ne dirêj dibe ne jî kurt." Mirov dikare vê gotinê ji bo nêzîktêdayîna rayedarêne dewleta tirk a bo nasnavê kurdan jî bi kar bîne. Lê, têkoşîna gelê kurd a bi salan bêhemdî be jî hinek gav bi rejîmê dane avêtin. Lewre êdî gelê kurd serî hildaye, derfeta dîkirandina çîroka "kart-kurt" nemaye. Ji ber vê yekê jî qedexuya li ser axaftina bi zimanê kurdî, ku di pratikê de rî li ber girtin, ne pêkan û qedexeyeke dûrî aqilan bû, hate hildan. Her wiha rejîmê ji devê serokwezîr û cîgirê wî "rastiya kurdan" nas kir.

Lê xwediyê rejîmê û aqilmendên wan tu caran bi temamî dev ji çîroka "kart-kurt" bernedaye. Van rojê dawîn em ji devê gelek nivîskarêne tirk heman çîrokê dibihiżin. Bi taybeti nivîskarêne Roj-

nameya Cumhuriyetê bi awayekî şermoke heman çîrokê tînin rojevê û vê çîrokê hêjîyî lêkolînê dibinin.

Ji bilî vê, tiştê ku nivîskarêne tirk van rojê dawîn pihet pê girtiye û bernadin, tevliheviya zimanê kurdî û nasnavê kurdan e. Ew dîtin di civîna dawîn a MGK'ê de ji hêla generalêne tirk ve jî hate dikiran din. Li gorî generalêne tirk bi dehan zara-vayêne kurdî hene, jixwe kurdî ne ziman e, lê loda peyvan e; ew peyv jî ji zimanêner derdorê hatine girtin. Ev gotin bo kurdêne xwenas dikarin bibin mijara henek û qerfan, bi tenê hinek kesen xwenenas dikarin bi van gotinan bixapin. Rêkûpêlî û reseniya zimanê kurdî ji hêla hemû kesen ku hinekî pê dizanin ve tê pejirandin. Digel ev qas çewsandin û berbendkirêne zimanê kurdî reseniya xwe daye çespandin. Bi dehan kovarêne ku bi kurdî derdikevin, rojnameya di destê we de û televîzyona ku bi milyonan kurd lê temaşe dikan van gotinan pûc derdixin.

Li aliye din hinek kes jî saziyên ku gelê kurd jî bo danîna wan gelek bedel dane û hê jî didin wekî mînak nîşan didin

û bi vî hawî jî idia dikan ku weşana bi zimanê kurdî ne qedexe ye. Biryarêne veşarî yê wezîrîne dewletê û êrîşen li ser saziyên ku bi zimanê kurdî weşanê dikan, wan gotinan pûc dikan. Berpîsê pîrbûna devok û zaravayan mêtîngîn in, heke ne jî zor û zilma wan bûya dê zimanê kurdî jî zû ve yekîtiya xwe pêk baniya. Heke mîrov bûyeren çend rojan bîne bîra xwe, dê ev yek diyar û zelal bîbe. Hê berî niha bi çend rojan, polîşen tirk bi vê mebesta astengirina kursen bi zimanê kurdî bi ser NÇM'ê û Înstituya Kurdi ya Stenbolê de çûn. Gelek radyoyen herêmî ji ber ku stranen bi kurdî weşandin, hatin girtin.

Her wiha êrîşen xebatkarêne li ser rojnameya me tê zanîn, ketina rojnameya me bo OHAL'ê hê jî qedexe ye. Li dadgehan xweparastina bi zimanê kurdî qedexe ye. Lewre jî hevalen me ji mañê xweparastinê bêpar ceza distîn. Du hevalen me hê jî girtî ne. Hefteya çûyî jî du hevalen me bêyî sedem hatin derdestkirin û pişti çend rojan hatin berdan. Ew mînak bi tenê bo nîşandana derewan bes in.

# Mukîrhatina artêşa tirk

## FRECÊ HEMÊ FREC

**A**rtêşa tirk êdî wê li pey hev der barê pirsgirêka kurdî de li xwe mukir bê. Dîsa dixuyêne ku artêşa tirk dê helwesta xwe ya li hemberî gelê kurd neguhere. Her wiha helwesta siyasetmedar, zanyarêne tirk û çapemeniya tirk jî bi gavavêtina artêşê ve girêdayî ye. Gavavêtina artêşê jî wê ji bêgaviyê pêk bê.

Çûna İtalyayê ya Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan li Tirkîyeyê û cihanê dengekî mezin veda, gelek pêşveçûnên girîng derketin holê. Gelek bûyeren sêrî rû dan. Derûniya kevneperek û nijadperestan li hev ket. Tirkêne xwedî "Apofobi" sewsî bûn û ev rewş hîn jî didome. Sewsî di hundirê artêşa tirk de jî pêk hat. Lê zêde xwe neda der. Artêşa tirk li vî alî û li wî alî dest bi çavtarsandin û fortan kiriye. Her wiha dewleta tirk bi daxuyaniyan li nêzîktêdayîna xwe ya li ser gelê kurd mukir tê. Yek ji wan jî di 5'ê berfanbare de pêk hat. Daxuyaniya artêşa tirk wekî "Nirxandina li ser terora PKK'ê" di hemû rojname û TV'yan de derket.

Rojnameya Milliyetê: "Artêş: Perwerdeya kurdî nabe" Li gorî rojname û ev, di vî warî de nirxandineke taybet e û têkîdarî çûna Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan a İtalyayê ye. Artêşa tirk di daxuyaniya xwe de li ser zimanê kurdî jî vê nirxandinê dike:

"Perwerdeya zimanê kurdî û weşana TV'yê di pratiķe de ne pêkan e, lewre zimanê kurdî ji pênc zaraveyan pêk tê. Di vê daxuyaniyê de xaleke balkêş jî ev e: Ji kîjan binyadê tê, bila bêne, hemwelatiyêne me dixwazin li kîjan dibistanê bixwînin, dikarin bixwînin, di hilbijartina pişeyen xwe de azad in. Tu astengî li ber bikaranîna zîmîn û navan nîn e."

Dema ku mîrov li rewşa wan û vê daxuyaniya wan dinêre niqteyên

**Derûniya kevneperek û nijadperestan li hev ket. Tirkêne xwedî "Apofobi" sewsî bûn û ev rewş hîn jî didome. Sewsî di hundirê artêşa tirk de jî pêk hat. Lê zêde xwe neda der.**

balkêş derdikevin holê.

1. Divê pêşî, mîrov li helwest û gavavêtinêne wan binêre. Hêlén bo demokrasiyê û mafêne mirovan hene an tune ne? Naskirina nasnameya kurdan heye an tune ye? Ji dil in an li pey xapandinê ne? Divê em vê binirxîn.

2. Rayedarêne dewletê her çiqas bibêjin me di warê demokrasiyê û mafêne mirovan de gavêne mezin avetiñe jî, serdanpê derew e. Çima? Ger li welatekî şerekî ku bi dehan salan in didome, hebe, çawa mîrov dikare qala nirxen mirovahiyê bike? Kes nikare tu wateyê bide van daxuyaniyê wan

3. Di demen wisa girîng de siyasetmedarêne tirk pişti ku artêş helwesta xwe diyar dike, daxuyaniyan didin. Ji bo pêşveçûnên nû, siyasetmedar li benda daxuyaniyêne artêşê dimîn. Ji qeyrana Sûriyeyê vir de ev rewş zelâtir bû.

4. Eger artêşa tirk helwesta xwe ya li hemberî gelê kurd biguherîne siyaseta tirk, zanîngeh û medaya wê de iflas bike.

Di warê zanyarîne bi taybeti zanîngehî tirk, hebûna zimanê kurdî û inkar kirin. Li gorî daxuyaniya artêşa tirk zimanê kurdî ji pênc zaraveyan pêk tê. Hejmara zaraveyan ci be jî, li gorî artêşê zimanê kurdî ji zaraveyan pêk tê û vê yekê dipejirîne.

Me li jor nirxandinê artêşê tirk ên der barê nasname û hebûna gelê kurd de bi çend xalan şirove kirin. Artêş dibêje bi zimanê kurdî perwerde û weşana televîzyonê ne mimkûn e. Ji ber ku gelek zarave di kurdî de hene; zimanê kurdî yekgirtî nîn e. Em dibêjin ger ziman serbest be wê yekîtiya zîmîn pêk bê. Em lava ji tu kesî nakin û li ber tu kesî nagerin. Ger we fêm kiribe demokrasî û aştî bo tevaya însanan baş e. Rojêne em dê azad bibin nêzîktir bûne û gelê me dê bi hêza xwe mafêne xwe bi dest bixe. Zanîngehî bi zimanê kurdî lêkolînan bikin; hejmara MED TV'yan wê zêde bibe; rojnameyîn ku bi zimanê biyaniyan mîvanî derdikevin wê veguhezin kurdî.

## Ferhengok

|   |   |
|---|---|
| <b>ajdan:</b> êzdan(filizlen-me)            | <b>mînak:</b> nimûne (örnek)              |
| <b>ajotkar:</b> şofér                       | <b>nigâşî:</b> hayalî, sanal              |
| <b>baskokirin:</b> kolunu kanadını kırmak   | <b>nik:</b> cem, bal, hindê               |
| <b>bîşik:</b> doktor                        | <b>pêgeh:</b> kapsam, alan                |
| <b>çewsandin:</b> baskı, sindirme           | <b>pergal:</b> sistem                     |
| <b>dadger:</b> hakim                        | <b>pêşangeh:</b> sergi                    |
| <b>daxbar:</b> xemgîn, diissoj              | <b>pêvajo:</b> doman (süreç)              |
| <b>dêmanî:</b> yerlesik                     | <b>radestkirin:</b> testîlmîkirin         |
| <b>derdestkirin:</b> binçavkirin (yakalama) | <b>rastmal:</b> yastikaltı                |
| <b>desthilatdar:</b> serdest (egemen)       | <b>repivan:</b> qaide (kural)             |
| <b>dilsojî:</b> dilşewatî                   | <b>rist:</b> rol, erk                     |
| <b>dilsozî:</b> bağlılık, sadakat           | <b>sazîmankar:</b> organizator            |
| <b>erdinigarî:</b> cografik                 | <b>serdem:</b> heyam (dönem)              |
| <b>erjeng:</b> tırsnak (korkunç)            | <b>sozret:</b> ecîb; rezîl                |
| <b>gef:</b> hereşe, tehdît                  | <b>sotin:</b> şewitandin                  |
| <b>gîlaz:</b> gerdan                        | <b>şewaz:</b> uslûp                       |
| <b>hîncet:</b> gerekçe                      | <b>tékçün:</b> yenilgi tewangbar: bükümlü |
| <b>kargeh:</b> işyeri                       | <b>xabzalok:</b> sosik, kêzika biharê     |
| <b>keleb:</b> kale                          | <b>xwegerikirin:</b> xwefedakirin         |
| <b>komkuji:</b> qetîlam                     | <b>xweperek:</b> bencil, bireyci          |
| <b>kujer:</b> qatil                         | <b>zagon:</b> qanûn                       |

Ji ber qeyrana aborî,

# Pîsesaziya Tirkiyeyê top avêt

E v demeke dirêj e ku qeyrana aborî xwe li bin guhê cihana global xistiye. Ji ber qeyrana aborî hilberîna gelek kargeh û febrîqeyan li welatên Rojhilata Dûr û welatên Ewrûpayê û her wiha yên li Rojhilata Navîn hate rawestandin. Bêguman, ev qeyrana aborî, ji ber tengijîna siyasi û iktisadî ya sermayeyê tê pê.

Berî vêga bo aboriya Rojhilata Dûr pilingen Asayê dihate gotin. Ji ber hilberîna bêpergal qeyranakê xwe lê pêça û vê qeyranê bandor li gelek welatan kir. Bêguman ne tenê qeyrana Rojhilata Dûr, ev demek dirêj e ku li Rûsyayê ji qeyraneke aborî serdest e. Berî vêga li Rûsyayê ji ber qeyrana aborî develasyon (kémkirina nirxa diravan) pêk hatibû.

Tirkiyeyê ji para xwe ji qeyrana aborî digire û ji niha ve bîryara rawestandin na gelek febrîqe û ji kar avêtinan tê girtin. Lî belê divê bê zanîn ku bi temamî qeyrana li Tirkiyeyê ne bi qeyrana Rojhilatê Dûr û Rûsyayê ve girêdayî ye. Wekî tê zanîn şerê li Kurdistanê ji aliye aborî ve dewleta tirk gelekî tengijandîye. Wekî mînak dewleta tirk di sala 1994'an de bi tenê bo şer 400 trilyon xerc kiriye. Ew pere ji ji derve biqerz (deyn) hatine stendin. Lî bi tenê di salê dawîn de qerza hundîrîn ji 4.2 katrilyonî derketiye 10.2 katrilyonî. Qerza derva ji di sala 1990'an de ji 41 mîlyar dollarî derketiye sed mîlyar dollarî. Her wiha enflasyona li Tirkiyeyê di ser hemû dewletên cihanê re ye. Dema mirov enflasyona hemû welatên Ewrûpayê bide ser hev ji bi qasî enflasyona Tirkiyeyê nabe. Ev yek ji aliye gelek rayederên dewleta tirk ve ji hate zimên.

Li aliye din bi pêvajoya Susurlukê re ji gelek tiştên balkêş derketin holê. Bi Susurlukê hate dîtin ku dewleta tirk ji aliye çeteyan ve tê birêvebirin. Butçeya dewletê di destê rantkaran de ye. Dema rantkar ji ber parvekirina pereyênu ku ji ber şerê li Kurdistanê bi dest dixin li hev nakin, di warê siyasi û aborî de dewleta tirk beramberî qeyranan dimîne. Wekî mînak pişti ku Korkmaz Yiğit hate girtin dewleta tirk bi tenê bi kasetekê 8 mîlyar dollar kete zirarê. Ji aliye din ve di wê pêvajoyê de dê dewleta tirk ji IMF'ye ji 9 mîlyar dollar kredî bistendina lê pişti qeyrana kasetê IMF'ye ji gava xwe paş de avêt û krediya bo Tirkiyeyê da iştalkirin. Ji aliye din ve dewleta tirk bi tenê ji ber bêdengiya xwe ya der barê Kormaz

Yiğit de di navbera sê rojan de ji borsayê 5.5 mîlyar dollar ji faîzan 966 mîlyar dollar û ji rezervên Banka Navendî mîlyarek û 265 dollar kete zirarê. Belê bi vê yekê faîz ji % 132'an derkete %150'an. Van rûdanîna bandor li ser bihayê holdîngîn mezin ji kir. Wekî mînak şîrkîten ku di 11'ê sermawezê de buhayêwan 10 katrilyon 75 trilyonî bû di 12'ê sermawezê de daketi 8 katrilyon 624



trilyonî. Digel van rûdanîna di warê sektora pîsesaziyê de ji li gorî istatistikên DIE'ye halê hazir hilberîn hatîye rawestandin. Li gorî istatistikê, par di hilberîna pîsesaziyen de ji %13 pêşketin hebûye, lê li gorî îsal û ji ber tesîra qeyranê hilberîn daketiye % 0.5'an.

Bêguman encamên vê qeyranê bêhtir wê tesîrî li ser kedkar û karkeran bike. Jixwe di van rojîn dawîn de tesîra xwe nişan daye ji. Di navbera hefteyekê de gelek şîrkît û sektoran hilberîn dan rawestandin û bi hezaran kes ji kar hatîn avêtin. Li Tirkiyeyê pişti qeyrana bi awayekî gelempêri di warê tekstîl û metalê de 45 hezar û 700 karker û karmend ji kar hatîn avêtin û li dora 1700 şîrkîtan ji iflas kir û her wiha ji hilberîna di sedî sed de, ji sedî 35 tê daxistin. Ji ber protestokirin û şermezarkirinê ji niha ve gelek sendiqe û parazgehêne komeleyen karkeran dest bi çalakiyên xwe kirine. Li gelek cihan grevî dest pê kiriye û xwepêşandan tê lidarxistin.

AZAD ALTUN

## Di meha Kewçerê de tekstîl di % 21 têk çû

| Hilberîna pîsesazî            | (%)   | Rêbîdan-kewçer | (%) |
|-------------------------------|-------|----------------|-----|
| Sektora pîsesaziyê a giştî:   | 0.5   | 4.7            |     |
| Pîsesazîya madenî:            | 2.1   | 8.6            |     |
| Pîsesazîya îmalatê :          | 0.3   | 3.8            |     |
| Pîsesazîya qûd:               | 10.4  | 7.5            |     |
| Pîsesazîya mensûcat:          | -21.0 | -14.6          |     |
| Pîsesazîya çap û kaxizan:     | 0.2   | 4.7            |     |
| Pîsesazîya kîmyewî:           | 5.9   | 2.6            |     |
| Pîsesazîya bi kevir û erdê:   | 11.4  | 5.7            |     |
| Pîsesazîya bingehîn a metalê: | -7.2  | -0.5           |     |
| Pîsesazîya mekîneyan:         | 0.4   | 11.4           |     |
| Sektora enerjiyê:             | 1.4   | 9.4            |     |

## Tesîra qeyrana aborî li ser kedkar û kargehan

\*Di sektora tekstîl û metalê de hilberîn rawestiya.

\*Santrala Mensucat a Edirneyê hate girtin 2 hezar karker bêkar man.

\*Ji Park tekstîlê hezar karker hatîn avêtin.

\*Lî Gebzeyê ji 14 kargehan 1538 karker hatîn avêtin.

\*Ji Sektora Testîlê ya Denizliyê 10 hezar karker hatîn avêtin.

\*Şîşe Cam û Paşabahçeyê ji hilberîna xwe ji sedî 35 dadixe.

\*Lî Ceyhanê Ceytaş tê girtin 650 kes bêkar dimînin.

\*Lî Entabê ji 120 hezar karker 12 hezar karker ji kar hatîn avêtin. Hilberîn dakeste %30'i.

\*Tofaş Paîlo hilberîn rawestandin. Renaultê hilberîn kêm kir.

\*ji Sankoya Entabê 2500 karker hatîn qewirandin.

\*Li Edenê dê heta sersalê 5 hezar kes ji kar bêr avêtin.

\*Li İzmîrê 300 şîrkît hatîn asêkîrin. Sê hezar kes bêkar ma.

\*Ji Odeya Pîsesazî ya İzmîrê 416 şîrkît vejetiyan.

\*Li Bursayê 410 firma hatîn girtin û zema bo karkeran hate iştalkirin, nêzî 60 hezar karker dest bi grevî dikin.

\*Li Corumê 5 febrîqe hatîn girtin. Li dora 500 karker bêkar ma.

Hinardeya hêkan a salê ji 20 mîlyon dollarî, kete di sedî de 20'an.

\*Li Meraşê li dora 15 hezar kes wê bêkar bimînin. Di navbera mehekê de wê tesîsîn mezin bêr girtin.

## AGIRÊ HUNDIR GURTIR BÛ

D ema ku mirov behsa qeyrana aborî ya li Tirkiyeyê bike divê ji binî ve bi qeyrana Rojhilata Dûr û Rûsyayê ve neyê girêdan. Bi tenê tesîra derveyî qeyrana aborî ya Tirkiyeyê kûrtir kir. Wekî tespîtekê mirov dikare bibêje ku agirê hundîrîn ji aliye piştgiriya derive ve hate gurkîrin. Edî ev agir dê bandorê li ser gelek kesan bike. Jixwe di salê dawîn de kedkar û karkeran di warê hatîn û qezencan de têra xwe zirar dît. Mehmiza wan bi awayê rasteqîn hê ji di asta salê 1990'ye. İro karker 100 mîlyon karmend ji 80 mîlyonî distînin. Lî belê lêcûyîn malbatake ku ji çar kesan pêk tê, li dora 190 mîlyonî ye. Agirê ku xwe li kedkaran pêça ber bi sermayeyê ve diçe. Belkî sermaye yekem car e ku beramberî agirekî wisa dimîne lê ev bi salan e hilweşîna di çandîniyê de, ber bi tunebûnê ve çûyîna sewalxwedîkirinê û têkçûyîna di her warî de tê zanîn. Lî di nav van hêmanan de qerzan, aborî ya Tirkiyeyê ber bi topavêtinê ve bir. Tirkîye di nav dewletên cihanê de dewleta herî zêde qerzdar e. Qerza bo derva li dora 100 mîlyon dollarî ye. Ji ber van qerzan ji sedî 90'ê hatîna xwe dide faîzan. Valahiya di deynîn derive de bi hejmareke rekor yanî 23 mîlyon dollarî li pêsiya her kesî ye. Bo xebatkaran ji butçeyê di sala 1990'î de di sedî de 40 hatîbû vejetandin, lê di sala 1998'an de para bo xebatkaran di sedî de 23'ye. Enflasyon di ser ya her kesî re ye. Neyeksaniya di warê parvekirina dahatinê de zêdetir dibe. Hêza stendinê têk diçe û malen ku tê hilberandin di dest de dimînin. Di sala 1997'an de dolar 105 hezarî bû lê iro 300 hezar e. Bi awayekî gelempêri ev yek rê li ber têkçûyîna jiyana kesen bindest vedi-ke.

Divê mirov çeli piştgiriya dewletê ya bo rantkaran ji bike. Sûb-vansiyon û prîmîn bo çandîniyê hatîn rakirin. Qeyraneke mezin xwe li hilberîneran pêça. Hemû bergiriyê bo rastkirinê bêkêr derketin. Ji ber ku bi tenê tesîs ne rast bû. Belê nexweşîna ku qeyrana diafirîne polîtikaya şîdetê ya li dijî kîşeyâ kurd e. Heta ku ev şer hebe dê aborî ji sererast nebe.

HÜSEYIN DENİZ

# Cejn û şahiyêñ di nav kurdan de

**D**i dîroka civakan de gelek bûyer û rûdanê pîroz û guherkar hene. Ev bûyer di dîroka civakan de bi gelek ristên mezin radibin û gel an jî netewe ji rêç û şopa ku hetanî wê rojê dabûne pey, vediqetin û berê xwe didin rêç û şopêñ din. Bo nimûne, di pêşengiya Spartakîs de têkoşina Gladyatoran a li dijî pergala koledar; li Frensayê şoreşa 1789'an ku di bin pêşengiya çîna birjuwa de pêk hat; Şoreşa Sovyetê. Netewe û gel jî ji bo ku dilgeşîya xwe der bibin û van rojêñ pîroz jî bir nekin, di salvegera van bûyerêñ navborî de şahîyan li dar dixin.

Şahî û cejnêñ neteweyî hene û yên gerdûnî hene. Bi piranî cejn û şahiyêñ gerdûnî rengêñ olî dihewînin. Bo nimûne, di nava misilmanan de Cejna Remezanê, di nava îsewîyan de jî Noel mînakêñ şenber in. Lê cejnêñ ne olî, lê di gel vê jî gerdûnî hene. Wekî mînak Newroz, têkoşina Sparakîstan, Şoreşa Birjuwa ya Frensayê. Mesela, Newroz weki cejna kurdan a neteweyî tê pejirandin. Lê piraniya gelêñ Rojhîlata Navîn û deveren din bi dilgeşî wê pîroz dikin.

Ji bîlî Newrozê di nava kurdan de gelek cejn û şahiyêñ din jî hene. Ev çalakîyen ku bi gelempêrî xwedî rengêñ sosyalî û çandî ne, li hin herêman têne zanîn lê li hinek herêman nayêne zanîn. Dema ku mirov bi hûrbînî û baldarî li naveroka wan mêze bike, diyar dibe ku ev cejn zêde motifîn İslâmî di xwe de nahewînin. Heta li gorî hinek lêkolîneran di cejn û şahiyêñ kurdan de bi piranî rengêñ ola Zerdeş her wiha Êzîdîtiyê berbiçav in. Mesela, di gelek cejnêñ kurdan de agir yek ji hêmanêñ bingehîn e. Lê li gorî İslâmî ev yek weki agirperestî tê dîtin.

## Cejna Tolan (toldan)

Ev cejn di nava kurmancan de bi navê Cejna Toldan, di nava Êzidî û dimil (kird) an de bi navê "Cemayı" û "Roja Ziyar" tê zanîn. Li gorî lêkolînan peyva toldan ji tolhîdanê tê. Li gorî hin gote-gotan di nava kurdêñ Zerdûstî de wê rojê Hûşeng agir peyda kiriye û disa di heman rojê de keyayê kurd Ferîdûn Dehak têk biriye. Lewre jî ev cejn di salvegera vê rojê de tê pirozkirin

Bi pey İ. Nûri Paşa cejnêñ bi navê "Dera Mezinan" (Deriyê Mezinan) "Kaksîl" jî ji serdemâ Ferîdûn mane. Ev cejn bo kesen leheng û qenc têne pirozkirin.

## Cejna Roja Ziyar

Celadet Bedirxan di hejmara 42. ya Kovara Hawarê de li ser cejnêñ "Cemayı" û "Roja Ziyar" radiweste. Ev cejn bi taybeti di nav Êzîdiyan de bi dilşadî têne pirozkirin. Di vê rojê de kurdêñ êzidî cilêñ qeseng li xwe dikin û li qadekê li hev dicivin. Hemû malbat xwarinêñ ku amade kirine, li cihekî datînin. Pişti ku navroj tê xwarin, dîlan tê gerandin; stran têne strandin, helbest tên xwendin, çîrok têne vegotin. Ev cejn bi naveroka xwe



Dîmenêñ ji şahî Kosegelî û Beranberdan



kultûrî ye. Ev cejna ku rengê geşte ñide, di nava hêşnayîye de bi aştî û biratî tê pirozkirin.

Celadet Bedirxan di dawiyê de vê nîrxandinê dike: İro her çiqas kurdêñ Êzidî û zaza her çiqas jihev hatibin dûr-xistin jî bi heman naverokê vê cejnê pîroz dikin.

## Cejnêñ li Dêrsimê

Nûri Dêrsimî li ser cejn û mihrîcanê vê herêmê wiha dibêje: Li gorî salnameya Rojhîlata di serê heyva berfanbarê de li dû hev sê rojan rojî tê girtin. Pişti rojiyê şahiyêñ mezin têne lidarxistin. Ev şahî li ber dilê kurdan geleki mezin û pîroz e. Lewre bo Zerdûst tê lidarxistin.

## Cejna Xidir-îlyas (Xidirelez)

Di dawiya meha rîbendanê de sê rojan rojî tê girtin. Di navbeyna van rojan de keç avê venaxwin. Li gorî baweriya wan xort dê de xewnê de avê bidine wan û heman xort dê 'bi wan re bizewicin. Pişti rojiyê ardê bi navê qawît ku jî ge-

nimê sorkirî yê hêrandî çêbûye, dikin tasikekî û tasikê li cihekî bilind datînin, li dora tasikê mûmîn vêxistî rîz dikin. Wê şevê li Xizir dipêñ. Sibetira dinê qawît bi rûn û hingiv çedîkin û li cînarân belav dikin.

## Şahiya Şêx Hadî

Turbeya ku ji bo damezirînerê êzîdîtiyê; Şêx Hadî hatîye avakîrin, ji aliye misilmanan di 1414'yan de ve hate rûxandin. Pişti hengekê ev turbe ji nû ve hate sazandin. Êzidî bo hec di dawîya meha rezberê de diçin serdana vê turbeyê. Ev ayîn bi amûrêñ muzîkê yên wekî; dahol, zirne, def û bilûrê têne kirin.

Minorsky li ser vê ayînê wiha dibêje: "Êzidî her sal di 23'ye rezberê de ayînêñ olî li dar dixin. Bi şev meşale têne vêxistin, muzîkjen amûrêñ muzîkê dijenin, bi İlahiyeñ olî bawermend baweriya xwe bi cih tînin."

## Kosegelî

Biharê di navbera 2030'ye adarê de tê lidarxistin. Di vê demsalê de hin sewal diçin berhev û hinek jî dizên. Pirozbâhi wiha ye: Bi rûpoşkî kulavîn rûyê mîrekî bi dest û pê tê pêçandin. Li ser serê wî du striyêñ di tanga hev de têne çikandin. Di bin striyan de du guh têne çêkirin. Her wiha tevgîredana wî jî li gorî rûpoş e. Di nav lingêñ wî de ji kulavê hişk hacetê mîraniyê tê çêkirin; binê çoka wî bi rişîyan hatîye xemîlandin; li paş wî teriyek heye. Dîsa di destê wî de çovek heye. Jina Kosegelî jî di rastiyê de mîr e. Lê bi kincen jinan ên gelêri xwe tevgîredaye. Serê xwe bi şareke kesk, sor û zer girêdaye.

Şahî wiha dest pê dike: Pêşiyê Kosegelî bi muzîkê re dest bi reqs û lîstikan dike. Dûre li jina xwe digere. Pişti ku jina xwe dibîne dest bi qêrînê dike, dide halanan. Jina wî jî nêzîkî wî dibe û dest bi teqlîta tewliyê zayendî dikin. Bi muzîkjen û komekê re dest mal bi mal digerin, bexşîşan berhev dikin.

Dema ku Kosegelî tê gerandin carna du kom li hev rast têñ. Di navbera herdu

koman de bi co û daran pevçûn dest pîdike. Di encama van pevçûnan de carna birîndarbûn û mirin jî rû didin.

Şahiya navborî di nav xwe de bi réziyi reçik e. Bo nimûne divê kesen ku di dilqê Kosegelî û jina wî de ne neyêñ naskirin. Tenê kesen ku şahîye li dar dixin wan dinasin. Ev lîstik carna ji aliye şeniyê gelek gundan ve bi hevbesi tê lidarxistin.

## Beranberdan

Şahiya beranberdanê ku di demsala payîzê de pêk tê bi navê Şahiya Şivanan jî tê zanîn. Ji bo ku mî di demsala zivis-tanê neyêne ber beran, divê ev yek de-reng pêk bê. Lewre jî beranêñ ku sor büne de meha tîrmehê de bo sê mehan ji ke-rî têne vegetandin

Beranêñ ku ji kerî têne dûrxistin bêtî sor dibin, mî jî li pey beranen digerin. Ev şahiya ku di meha kewçêrê de pêk tê bî vî rengî ye: Beran pêşiyê têne şüştin dawêñ wan bi dawrişîyan têne xemîlandin, li ser qiloçen wan neyik û sêv têne girêdan. Piştre şeniyê gund beranen ber nava kerî didin. Her wiha keç, xort, jî zarok jî xwe bi çekên qeseng girê didin û dixemlinin. Dîsa xwarinêñ cur bi cur têne çêkirin û li qada Beranberdan an jî li queraxa avekê têne amadekirin. Di vî kîliyê de beran pir bi heyecan û hêrs in Gundî kom bi kom bi muzîkê re beranen ber bi kerîyan dibin. Dema ku beran ber xwe didin kerî ji nav kerî hin mî ber bi berên diçin. Di nav şenî de baweriye balkêş heye. Li gorî rengê mihen ku carapêşin ji nav kerî derdikevin li ser rewşa zivistana wê salê texmînan dikin. Li gorî baweriye ger rengê miha ku pêşiyâ giştan ji nav kerî derketiye tarî be, zivis-tanê zêde xedar be û demsalê bêber derbas bibe. Lê ger vekirî be zivistanê bi berf û bager derbas bibe.

Dema ku beran dikevin nava kerî dest pê dike, muzîk tê jenandin û xwarin tê belavkirin.

MEMED SERHEDİ

Çavkanî: Arya Uygarlıklarından Kürtler (Selahattin Mihotlu).

Kurt Tarihi ve Uygarlığı (Cemît Bender)

# Kurdî: Zimanekî Îndo-Ewrûpî (I)

Kurdî endamê koma zimanê Îndo-Îranî yê ku koma şaxeke malbata Îndo-Ewrûpî ye. Malbatâ Îndo-Ewrûpî li ser rûyê cîhanê malbatâ herî mezin a zimên e.

Zimanê kurdî ji her wekî zimanê farisi di nava zimanên beşa rojavayê Îranê de cih digire. Zimanên mîna îskîfi, avestayî û ji zimanên nûjen ji paştoyê ku afganî bê dipeyivin zimanên beşa rojhilate Iranê yê malbata Îndo-Ewrûpî pêk tînin.

Kurdî, aşkanî (partî), pehlewî, belûcî û mazandaranî ji beşa bakur a zimanên rojavayê Îranê ne, li aliyê din farisi û farisiya dema navîn (pehlewiya sasanîyan) ji beşa başûr a zimanên rojavayê Îranê ne.

Di demen kevnare de şaxa rojava ji zimanên wekî farisiya kevn û medî pêk dihat. Tê gotin ku kurdî ji medî zêdetir nêzî farisiya kevn e.

Ji aliyekî din ve, kurdî (rojavayî) û osetî (rojhilatî) zimanên bakurê Îranê pêk tînin. Li Tirkîyeyê (li bajarê Bilîs, Erzêrom, Qers û Antalyayê) û li Gurcistanê li dora 6 sed hezar kes bi zimanê osetî dipeyivin. Çavkaniyeke peyitandî bo hejmara tezez a kesen ku bi kurdî dipeyivin nîn e. Serjimara kurdan di navbera 20-40 milyonî de diçe tê. Ev tabloya li jêrê xebata Hassanpour (1992) ji xwe re bingeh digire. Ew xebat, li gorî texmîna neteweperwêren kurd serjimara kurdan a sala du hezarî nîşan dide.

|             |               |                |
|-------------|---------------|----------------|
| Welat       | serjimar (M.) | kurd M. (rêje) |
| Iraq (c)    | 23.753        | 6.65 (%28)     |
| Tirkîye (a) | 67.748        | 15.58 (%23)    |
| Îran (b)    | 74.644        | 11.94 (%16)    |

## Îndo-Ewrûpî

I

### Îndo-Îranî

| I         | I        | I         | I        |
|-----------|----------|-----------|----------|
| Hîndî     | Îranî    |           |          |
| I         |          |           |          |
| Sanskritî | I        | I         |          |
|           | I        | I         |          |
|           | Rojavayî | Rojhilatî |          |
| I         | I        | I         | I        |
| Farisiya  | Medî     | îskîfi    | Avestayî |
| kevn      |          |           |          |

|                 |        |            |
|-----------------|--------|------------|
| Sûriye (d)      | 17.328 | 1.90 (%11) |
| Sovyetistan (e) |        | 0.73       |

|                                       |                      |
|---------------------------------------|----------------------|
| Bi giştî                              | 36.800 milyon        |
| Serjimara kurdan di sala du hezarî de |                      |
| (a) Kendal (1980)                     | (b) Ghassemlo (1980) |
| (c) Vanly (1980)                      |                      |
| (d) Nazdar (1980)                     | (e) Kendal (1980)    |

### Kurdî û farisi

Zaravayên Kirmancî-kurdî (1) (kurmancî/soranî û zaza/goranî di nava yên din de) gelek aliyê zimanên kevn ên îranê parastine. Lê belê taybetiyê rézimanê yên mîna tewangbariyê di kurdî de heye, di farisiya nûjen de nayê dîtin. Kurdî di zaravayên xwe de dirûvê cuda yê tewangbariya dem/dirûv nîşan dide. Tewangbarî di zimanên rojhilate Iranê yên wekî paştoyî (Kalbasi 1988) de ji hatiye

destnişankirin, lê ew di zimanê farisi û zimanên pêşrewê wî de tu car bi sergihayî bi pêş neketiye. Ev tewangbariya di paştoyî de ji dibe ku ji ber têkiliya wî zimanî ya bi zimanên hîndî û pamîrî re be. Her wiha tewangbariya di kurdî de ji dibe ku ji ber bandora zimanên kafkasî (wekî hu-rî) be ku li herêmê pê dihat axaftin. Bingeja tewangbariya kurdî hêjayî lêkolînê ye. Tişte balkêş di warê ergatîfiya kurdî de ev e ku du zaravayên kurdî kurmancî (Bakur) û soranî (Başûr) dirûvên ji hevcuda yên tewangbariyê dinimin (Bulut 1995). Tewangbariya dema borî ya lêkerên gerguhez a soranî ku şan bi şanî tewgera cînâvkân kurtkîrî ye di xebata "Friend 1985" hatiye gotübêjkirin. Lê tewangbariya di kurmancî de répîvanek binesazî ye ku dai navan de û di kişandin û teşegirtina lêkeran de xwe dide der (Matras 1992). Li gorî Dorleijn tewang-

bariya zaravayê kurmancî bi tunebûnê re rû bi rû ye.

Di farisi de qertafa /ra/ ya diyarkeriya bireseran pêgeha peyvîn vî zimanî firehitir dike. Ew yek di kurdî de nîn e, lewre ji kurdî ji vî mafî bêpar e. Ew diyarker di tirkî û zimanî ûrdûyê de ji xwediyê heman rolé ye. Dibe ku hebûna vê qertafê di zimanê farisi de ji ber têkiliya wî ya bi zimanî tirkî û moxoli re be.


Cudatiyeke din a di navbera kurdî û farisi de hebûna cînâvkân qertafî ya di soranî de ye ku ew yek têkildarî tewangbariya kurdî ye. Bi qasî ku ez dizanim taybetiyeke bi vî rengî di farisiya kevn de ji nehatiye ditin.

Cudatiya zayendê ji di zaravayên kurdî yên mîna kurmancî de hatiye parastin ku ew xislet ji di farisiya nûjen de nîn e.

SIAMAK REZAEI DURROE  
Werger ji îngilizî Samî Berbang

## Tirkî û Ewrûpa

NEJDET BULDAN



Gelo kî dizane ku Tirkîye ci dixwaze? Erê Öcalan hate Romayê an ji bi awayê ku ew dibêjin li Romayê hate girtin. Ew dawet û şahiya dagirkeran vala derket. Li gorî gotinê wan pêwîst bû ku İtalyayê Öcalan teslîm Enqereyê bikira. Dîsa li gorî gotinê wan ew qatîlê sih hezar însanî ye û gelek gotin, nîvîs û bîryarê gemarîtir. Derew û gemarî li gorî rewşa Tirkîyeyê ne.

Tişte herî balkêş ev e ku Tirkîye cezayê mirinê ji zagonê xwe rakira tirsek ji bo Öcalan hebû. İtalya Öcalan dida Tirkîyeyê an ne, ew mijareke din e. Lê belê hingî tirk dê piçekî biheq bûna. Tirkan cezayê dale-qandinê ranekir. Sedem ci ye? Sedem ew e ku daxwaza tirkan darizandina Öcalan nebû. Tirkan dixwest ku Öcalan parce parce bikin. Ew tiş ji li nik Ewrûpiyan hovîti ye, barbarî ye. (Bê guman sedema nedana Öcalan bi tenê cezayê mirinê nebû, polîtik bû. Lê ji bo demekê em ê li ser van gumanan bisekinin.)

Niha agirbesta PKK'ê ya yekalî dimeşe. Li ser vê agirbesta yekalî bangê navneteweyî ji hene ji bo Tirkîyeyê. Yekîtiya Ewrûpayê û hemû saziyên wê gazî Tirkîyeyê dîkin ku şer rawestîne. Dagirker ji wan bangan re guhêne xwe digirin. Hem qala aştiyê dîkin hem qala kuştina sih hezar mirovî û wêrankirina "Güneydoğu" yê dîkin, dibêjin 'heya niha sed mîlyar dolar li vî şerî hatiye serfîkirin' û tişten dîtir... Dema mirov dibêje: "Baş e, fermo agirbestê pêk bîne.", ew dibêje: "Na emê şerî xwe berdewam bikin." Bi van gotin û kirinan ji mirov baş dizane ku niyeta tirkan ne aşti ye. Hêviya wan xelaskirina şoreşekê ye. Komkujiya miletékî ye.

Serokomarê wan bi fermî li Awistûryayê ji got ku pirsgirînga kurd cînîne. Lê Ewrûpî ji re dibêje: "Me fêm kir ku li Tirkîyeyê pirsgirînga kurd tune ye. Lê belê pirsgirînga kurd li hemû deverên Ewrûpayê ye. Problema me ye ji..." Rojnamevanen cîhanê dibêjin ku rûyê Demirel sor bûye. Bi rastî ew rûsorbûn nîn e. Rûreşî ye ji bo Tirkîyeyê.

Darizandina birêz Öcalan a navneteweyî gumanekî sist e. Loma dadgeheke wisa heke Tirkîye ji di kursiya gunehbaran de nebe, Öcalan wê dadgehê napejîrîne. Serokê PKK'ê qebûl ji bike, kurdêñ welatparêz li ber

nayê. Bi dîtina min darizandineke li İtalyayê hê gumanbartir e û ew ji li dijî xwestina tirkan e.

Mîna ku tê dîtin Amerîka ji li ser konferanseke navneteweyî radiweste. Her dem tirk xwe kîfxweş dîkin ku DYât li piş wan e. Belê DYât li ser şerî ku tirk dimeşînin gelekî ranewestiyaye. Lê belê li ser çareseriyeke siyâşî her dem dengê xwe bilind kiriye.


Yekîtiya Ewrûpayê bi çend bîryaran xewnen tirkan kîrin kabûs. Ji bo parastina İtalyayê li hemberî Tirkîyeyê (ambargoya aborî û êrîşen hovane). Ji bo gefen ku Tirkîyeyê li Ewrûpayê dixwe. Ji bo ketina wan a nava Yekîtiya Ewrûpayê bê çareserkirina kîşeya kurd û hwd.

Niha dor a kurdan e. Bi xebatên dîplo-matîk, bi xebatên neteweyî... Di warê dîplo-matîk de ji ber ku rewşike nû rû daye, bî-yarê ku di vê demê de bîn girtin (baş an xerab, dûr an ji nêzîk) dê qedera kurdan diyar bikin.

Neteweyî ji ber ku sivikatî û giraniya welatparêziye demen wisa de eşkera dibin. Ji ber ku mesele ne tenê tengaviya Öcalan e. Em hovîtiya tirkan bi bînîn û bibin Kurdistanî bes e.

Bi jina serbilind re hevpeyvîneke nîgaşî:

# 'Can ji bo evînê, evîn ji bo azadiyê'



**J**i kerema xwe re hûn dikarin  
xwe bi me bidin nasîn?

Ez ji deşteke Kurdistanê me. Bavê min digote min: "Tu di şeveke sar de ji dayik bûyî. Lê wê rojê destê sibe dinya xwes bû. Tav sor û tîrêjên rojê ji pir dijwar bûn." Çimkî evînê aj dabû, birîna axê bi xwînê dihate dermankirin wê sibê.

We behsa evînê kir. Tu evînê çawa  
sîrove dîki?

Hîna ne dûr e ku têkiliya min bi evînê re çêbûye. Ez hîna nû fêm dikim ku evîn ne karê her kesî ye. Bes kesê ku bikaribe "can ji bo evînê, evîn ji bo riya azadiyê feda bike" dikare bibe evîndar û barê evînê hilgire. Ji ber ku evîn piyê jiyanê ye. Jiyaneke bêevîn, wekî miroveke/î bêdil e. Mirovê bêdil jî mirin e.

Di dema pêş de we têkiliya wê bi  
evînê re çêbibe gelo?

Dilê ke xweperestiyê bi germbûna xwe nesojîne, nikare evînê di dilê kesî de biçîne. Dilê ku evîn tê de tunebe, ew dil li xwe dibe agir û xwe disojîne. Ji bo vê jî ya pêwîst ew e ku evîn di mêtî de germ bibe, piştre jî têkeve dil. Evîna ku di mêtî de germ nebe û derbasî dil nebe, temenê wê kin e. Ji ber ku bi tenê girêdayî hestan e. Cihekî hest lê têr bibin ango li ser mêtî serwer bibin, evîn

vedimire û hêdî hêdî basko dibe.

Bi kinahî evîna min sê rojan di dilê min de hewiya. Roja çaran bi zor û lêdana dil, evîn ji dil derket, cihê evînê nefrîn girt û nefrîn jî bû elem kete dilê min.

*Roja zayina we, mîr û jînê hûn çawa dinirxînin?*

Roja azadiya min "têkbirina mîrperestiyê (erkegi öldürmek)" ye. Têkbirina mîrperestiyê jî azadiya jînê ye.

Rêgezeke sosyalîzmê ye an jî "...vekirina riya şoreşê, rêxistin û yekbûn e. Têkbirina faşizmê, newekhevîyê, serdestiya xweperestî û diktatoriye ye."

*Erka ku evîn iro bi cih tîne ci ye?*

Jin nîvê civakê ye. Gava ku civak ji aliye manewî ve jînê ji dest bide, dê nîvê jîyanê jî ji dest bide. Çawa ku kevok nikare bi baskekî bifire, lewre ne pêkan e ku mirovahî bêyî jînê doza azadiyê bibe serî. Di dema iro de jîn di nava doza azadiyê bi rola fermandariyê radibe. Heta em dikarin bibêjin, jînê dilê mîr li livbazî û çalakiyê germ kiriye.

Çalakiya Hevalê Fikri li ser rêz û rêcikîn fermandariya Hevala Sema Yüce hate pêkanîn. Tişte heri girîng, jînê kiriye ku mîr ji bo jînê jî doza azadiyê bike. Ev rewş, bi dilaweriya jînê û rêzgiriya wê ya bo jîyanê pêk hatiye. Lewre mîr ne bi qasî jînê bengî û evîndarê azadiyê ye. Ji ber ku jîn du caran kolê bû. Hem koleyê dijmin hem koleyê mîr. Ji ber vê yekê pêwîstiyâ jînê ya bi azadiyê bêhtir bû. Lewre bi awayekî dil û can û dilsoztir ser û doza

azadiyê kir û dîke.

*Zîlan ji bo jînê ci ifade dîke?*

Zîlan ji bo jînê çav, dil, ziman û vîn e. Çav e, çimkî pê pêşîya xwe dibîne û dimeşe. Dil e, ji ber ku baskokirina tîrsê e û vejîna dilaweriye ye. Ziman e, lewre iro bi awayekî azad xwe pê ifade dîke û doza mafîn xwe dîke. Û vîn e jî, ji ber ku bi dîtina pêşîya xwe re dikare biryarê bide û di riya biryarê re canê xwe gorî bike.

*Hûn dikarin kesayetiya Zîlanê bo me bînîn ser zîmîn?*

Zîlan ew qas mezin e ku, zimanekî ne pîspor û şareza nikare hilîne. Bi rastî hunermendî pêwîst e. Lê ger em ji mafê wê neyîn der jî, dîsa jî em dikarin bêjin Zîlan bijîşk e. Hem jî ne bijîşkeke ji rêz ye. Çimkî her bijîşk nikare bi xwe xwe amelîyat bike û kezeba xwe ji nava xwe derxîne. Zîlan hem xwe û hem jî kezeba xwe ya xirabûyî, amelîyat kir. Peyre kezeba xwe diyarî axa nexweşbûyî kir. Ji bo vê yekê iro Zîlan, di her dilê ku bo welat disoje de evîn e. Ji ber me ku evîn bo doza azadiyê gorî kir.

Zîlan, çawa ku di pirtûka jîyanê de bûye nimûneya lehengî û serbilindiya jînê, ewqas jî bûye dilaweriye ku êdî ji dilaweriya mîr derbas kiriye û xorura wî di nava heybet û mezinahiya xwe helandiye.

*Wekî jîneke kurd niha hesten çawa li te peyda dîbin?*

Bi qasî ez dilxweş im her wiha ew qas jî pêjna xemgîniye dikim. Ez gelekî pêkfxweş im lewre ez leşkerê Hevala

Hîna ne dûr e ku têkiliyo min bi evînê re çêbûye. Ez hîna nû fêm dikim ku evîn ne karê her kesî ye. Bes kesê ku "can ji bo evînê, evîn ji bo riya azadiyê feda bike" dikare bibe evîndar û barê evînê hilgire. Ji ber ku evîn piyê jiyanê ye. Jiyaneke bêevîn, wekî miroveke/î bêdil e. Mirovê bêdil jî mirin e.

Zîlan im. Ev, ji bo min cihê serbilindi şanazîye ye. Ji ber vê hindê hesten gelekî hêja û bêhempa li min peyda dîbin. Lê wekî min da xuyakirin ez xemgîn û daxbar im. Lewre ez deyn-darê Hevala Zîlan im. Wekî diyar e lêvegerandina maf û deynê Hevala Zîlan ne hêsan e, gelekî dijwar e. Çimkî Hevala Zîlan bi xwe re pergala împeryalîzmê têk bir û basko kir. Her wiha Hevala Zîlan, riya jîholêrakirina jîna binketî jî vekir û li her derê ronahi çand. Di vî warî de karîn û zamîna xwe gelekî kêm dibînim. Ez xwe qels û lawaz dihesibînim. Ji ber vê çendê jî ez xemgîn û daxbar im.

*Gelo we dil heye ji bo jînan mesajekê ragîhînîn?*

Em di pêvajoyê pir dijwar û nazîk re derbas dîbin.

"*Bi Mazlûmî partîzani*  
*Bi Egîti artesi*  
*Bi Zîlanî azadî*"

Pêvajo ewqas dijwar û nazîk e. Ji ber vê hindê, di jiyanê de her gaveke jînê azadiyê û di şer de jî her guleya wê jî pêwîst e bo serkeftinê were avêtin. Ji ber ku dirûşma 1998'an "Di warê jiyanê de azadî, di warê şer de serkeftin!" vê yekê dide ber me. A girîng jî divê jîn bi ruhê vê dirûşmê û bêdudîlî û bi Zîlanî azadiyê hembêz wîbi. Lewre guman tune ye ku, em bi vê yekê bawer in. Hêvidar in ku em dê di demeke kin de bi hev re vê yekê bibînin û em spas dîkin.

MUHAMMED MAHMO

□ 21 berfanbar 1994:

**Mustafa Tezşah dest bi maratona bezê kir**

Bezayê kurd Mustafa Tezşah di 21'ê berfanbarê de ji bo protestokirina kîrinênu ku li Kurdistanê dibin, dest bi maratona bezê kir. Ew ji Hambûrgê ber bi Bonê ve leziya. Maratonê 2 hefteyan dom kir. Tezşah 500 Km. yan beziya. Mustafa Tezşah armancâ xwe wiha anîbû zimên: "Ez daxwaz û qeweta 40 milyon kurdfî di hundîrê xwe de his dikim."

**BÜYERINE JI DİROKÊ**

□ Berfanbar 1994:

**Awûkatê Tirkîyeyê istifa kir**


Awûkatê Tirkîyeyê yê Dadgeha Maten Mirovan a Ewrûpayê, Prof. Bakur Çağlar li Strasburgê istifa kir. Çağlar sedema istifakirina xwe wiha diyar kiribû: Tirkîye hemû peymanê navneteweyî imze dike lê wezîfea xwe bi cî nayne. Wî wiha gotibû: "Ez êdî şerm dikim ku têkevîm dozêne Tirkîyeyê."

# Berhemâ têkoşîna sed salan Komara Mahabadê

Qazî Muhammed li Mahabadê ji malbateke dadger e, kurê Qazî Elî û newiyê Qazî Qasim Qazî Muhammed, xwendîna bingehîn li medreseyan digire û Qazî qazîtiyê jî li cem bavê xwe hîn dibe. Qazî Muhammed rewşenbîrekî pêşketî bû. Her wiha gel baş nas dikir; Sosyolog bû. Qazî Muhammed zimanê Farisî, rûsî, İngîlizî, erebî û azerî jî dizanibû.

**B**i boneya salvegera Komara Mahabadê û Serokê wê Qazî Muhammed Înstîtuya Kurdi û Navenda Çanda Mezopotamya şaxa İzmîrê konferanseki li dar xist. Konferans ji aliyê Mele Reşit û Mele İsmet ve hate pêşkêskirin. Mele Reşit li ser taybetiya Komara Mahabadê rawestiyâ û dîtinê xwe wiha derbirin: "Komara Mahabad di dîroka gelê kurd de komara yekemîn e û komareke yekane ye, ji ber ku di dîroka gelê kurd de heyâ niha tu komar ava nebüne. Berî komara Mahabad dîsa tu komar nehatine avakirin ji bo wê jî komara yekemîn e." Li gorî wî, Komara Mahabadê ne rasthatinek e, berhemâ têkoşîna sed salan a gelê kurd e. Mele Reşit bal kişand ser Şerê Cihanê yê Duyemîn û wiha berdewam kir: "Di Şerê Cihanê yê Duyemîn de gelek welat hatin dagirkirin, ji van yek jî Iran bû. Beşike İranê ji aliyê İngîliz, Sovyet û Almanan ve hate dagirkirin. Bi vê yekê Iran jar bû û rewşa kurdan jî bi pêş ket û ges bû, hinek kurdên ku koçber bûbûn ji vê fersendê istîfade kirin û vegeriyan welatê xwe." Herwiha Mele Reşit bal kişand ser têkiliyîn kurdan û Sovyetê û mînaka dawetkirina heyeteke kurd ji aliyê Sovyeta Rûs ve da. Wî got ku Sovyetê di sala 1941'ê de heyeteke ku ji sih kesî pêk dihat, bi awayekî fermî dawetî Rûsyayê kir û di nava van de Qazî Muhammed ji hebû lê ev delegasyon ne ji rêtixistanan, ji serokeşîran pêk dihat û li wê derê rûsan gelek soz jî dane kurdan.

Mele Reşit got ku bi endambûyina Qazî Muhammed di sala 1944'an de bo Komeleya Jîyanê ya Kurdistanê di navbera Komeleya Jîyanê ya Kurdistan û Komeleya Hêvî de bîryar hat dayin, ji bo ku her çar perçeyen Kurdish-




Serokê Komara Mahabadê Qazî Mihemed

tanê bibin yek. Wî dema damezirandina Komara Mahabad jî wiha anî zimên; Roja 22'ê rîbendana 1946'an ku ala Kudistanê li Meydana Çar Çira hate bilindkirin, û bi teqîna sîsed (300) guleyi, Avabûna Komarê hate îlankirin. Qazî Muhammed wê rojê derkete hemberî girseyê û wiha got; "Gelê Kurd geleki serbixwe ye, iro li ser xaka xwe dijî".

Mele Reşit di axafîna xwe ya dirêj de li ser bajarê Mahabadê jî wiha got: "Bajarê Mahabadê bajarekî dîrokî û kevnare ye. Ji medan vir de kurd lê jiyane.

Mele İsmet jî li ser xerakirina komarê sekînî. Wî got ku rîvebirina komarê gelekî demokrat bû, lê belê gelek kîmasiyêne wê jî hebûn, sisteme eşîretan nehate xirakirin. Mele Reşit di vir de bal kişand ser xayinderketin û xwefirotina hinek serokeşîran û got ku pişti vê yekê Rûsyâ ji komarê re îxanet kir, herwiha pişti hevdîtina serokê İranê bi Rûsyâ û Emerîka re Ûris leşkerên xwe tev de paş ve kişand. Pişti vê qewimînê dengeyên di nav kurdan de xera bûne. Pişti pêvajoyekê leşkerê İranê êrîş birine ser bajêr û Qazî Muhammed girtine binçev û dawiyê idam kirine. Serokê Komara Mahabadê Qazî Mihemed roja 30'ê adarê, ha-te infazkirin.

DAVUT ÖZALP / İZMİR

**ÇAVDÊRÎ**

## Pêşangeha kitêbên kurdî

MIRHEM YİĞİT

**S**iwedji her welatekî din ê Ewropa zêdetir bûye welatê weşanxane û kitêbên kurdî. Kitêbên mohra weşanxaneyen li Swêdê hildigirin, bûne bi sedan. Edî divê mirov ne di salan de belê di mehan de li hejmara kitêbên nû binêre. Berê ji salê heta salê çend kitêb derdiketin, lê niha ev hejmara ji mehê bûye çendek. Roja ev derketin dakeve hefte û rojan jî dê bê.

Kurd dereng ketine, mesafeya nav wan û neteweyen din fireh bûye, ew û dînyaya iro gelekî dûr ketine ji hev. Kitêbxaneyen xelkê û ne serî û ne binî ne, bi sedhezaran cild hene di wan de. Kurd vê dibînin, gerek bibînin û ya ku dibe sebeba şewta pozê xwedîqelemen kurd jî ev e. Tişten bêne nivîsandin bêhejmar in, tema bêdawî zehf û zêde ne. Bûyer, qehremânî û berxwedanen zîndanî û şervanen welatê me her yek bi serê xwe têra çend romanen dîkin. Aliyên lêkolîn û legerînan dixwazin û destnedayîne, ev çend send sal in ketine ser hev. Mesele maye rewşenbîr û nivîskarîn me bi kêt bén û binivîsin. Kar pir e û divê bê kirin. Di nav 12 û 13'ye û mehê de 20 weşanxaneyen kitêbên kurdî li bajarê Stokholmê pêşangeheke durojî li dar xistin. Bi giş zaravayan, çend ziman û alfabeyan salineke mezin seranser bi kitêbên kurdî û li ser kurdan hatibû xemilandin. Her der bûbûn kitêb. Dîmen û tabloyek xweş çêbûbû, kîfa mirov dihate pê re.

Xwendevanen li derveyî Swêdê û nemaze yên li Kurdistanê, dibe ku navê van weşanxaneyen meraq bikin. Ev in navê wan: Apec, Rewşen, Helwest, Deng, Diljen, Jîna Nû, Kitab-i Erzan, Kawa, Medya, Nûdem, Vate, Jîndan, Bîrnebûn, Roja Nû, Peyam, Pencînar, Dugir, Rabûn, Rehend, Gizing. Pêşangeha îsal a sisîyan bû. Berê jî, salê buhûr du pêşangehîn din ji ya îsal re bûbûn zemîn û rêxeşkir. Di pêşangeha îsal de hatin û çüyin ji berê baştır bû. Kitêb jî zêdetir hatin firotin. Amadekirin, organîzîkirin û birêvebirina pêşangehî jî serketîtir bû.

Li tenîşa pêşangeha salona pêşangehê, salinek jî ji bo semîneran hatibû terxankirin. Semîneren îsal jî balkê û enteresan bûn. Guhdar û besîdarên hineka ji wan, di salonê de hilnedihatîn. Gelek kesan li ser lin-gan, şipê guhdariya semînerdaran kirin. Wek nimûne semîneren Selîm Berekat û Dr. Ebasê Welî, Selîm ji Başûrê Biçûk e û niha mala wî li Qibrise ye û Dr. Ebas jî li Londra dersdarê zanîngehê ye. Niha wek dersdarê mîvan li Zanîngeha Upsala dersan-dide. Romanîvîsê navdar Selîm Berekat cara ewil bû hatibû Swêdê û di pêşangeheke wiha de besîdarî dikir. Li ser berhemên xwe axîvî û piş re munaqeşeyek germ dest pê kir. Munaqeşe li ser xalekê zêde kom bû. Ew jî ew bû, çîma Selîm romanen xwe ne bi kurdi belê bi erebi dinivîsine. Selîm jî digot ku kurdîya ew zane têra nivîsandina romanen nake, belê romanen wî bi ruh, nav û cih û naveroka xwe kurdi ne.

Xaleke din ku hêjâyî gotinê ye besîdariya nivîskarê Swêd Ulf Löfgren e. Ev birêz nivîskarê kitêbên zarakan e û kitêba wî bi navê Rindo ji aliyê Weşanxaneyen Apec ve bûye kurdi. Löfgren kitêbên xwe imze kirin. Ew jî bi qasî me kurdan û belki jê zêdetir ji me bi kêt bû.

Dawî divê mirov bêje ku pêşangeha îsal, weşanxane û nivîskarê kurd li hev nêzîk kirin û du roj jîyanâ bi hev re, di nav hev de û li tenîşa hev, dê bandoreke xurt bike li ser têkiliyîn ji niha û pê de, dê bibe faktoreke handayîna nivîskar û xwendevanen me û hinekî din dile me bi kitêb.

# Serokê HADEP'a Stenbolê Av. Mahmut Şakar:

# Dewlet li pêy hayfa têk

Polîfîkaya fermî ya li ser HADEP'ê diyar e. Pişti parfî girtin li serê dewletê bû bela, dewletê dest ji vê rîbazê kişand. Niha dixwaze kelehê ji navê vegire û bi dest bixe. Doz û daxwaza teslîmiyetê hate kîrin. Her wiha xwestin rola "Îdrîsî Bitlîsî" bi me bidin lîstin.

*Serokê HADEP' a Stenbolê Av. Mahmut Şakar, roja 25' ê kewçêrê dema ji HADEP' a Stenbolê ber bi Taksîmî diçû, tevî çend hevalên xwe yên HADEP' i hate derdestkirin. Heman rojê li Taksîmî û li hin herêmén din ên Stenbolê bi qasî 300 kes hatin binçavkirin. Pişti 6 rojan, 45 kes derketin pêşberî Dadgeha Ewlekariyê ya Dewletê DGM' ê. Ji wan kesan ku Mahmut Şakar jî di nav wan de bû, 13 kes hatin girtin û ew şandin Girtîgeha Ümraniyê. Av. Mahmut Şakar, der barê rewşa dawî, pest û zordariyên li ser HADEP' e panoramaya rewşa dawî ya Tirkîyeyê, helwesta saziyên demokratik li hember wan û çend xalén din pirsên me bersivandin*

*Birêz Şakar pest û kotekiyên ku bi salan e li ser HADEP' ê têne meşandin, ev du meh e ku, bi asteke erjeng û sosret xwe didin der. Hün van rûdan nan çawa şîrove dikin?*

□ Pest û kotekiyên li ser HADEP' e, ji zilm û zordariyên ku bi salan e li ser

gelê kurd têne meşandin, ne cuda ne. Ji berê ve grafika êrişan, li gorî taybetiyên pêvajoyê xet û xêzek ji xwe re dîtiye û meşiyaye. Komkujiyên kontrgerîla ku li dijî gelê kurd, li dijî rewşenbir û welatparêzan dest pê kiribûn, pişti demeke kin berê xwe daye partiyên kurd ên siyasi. Wekî tê zanîn hedefa yekemîn a kontr-gerîla, Serokê HEP'a Amedê Vedat Aydin e. Ji ber vê yekê êrişen dawî ne tiştekî nû ye. Lê pêvajoya ku gelê kurd iro tê de ye, ne pêvajoyeke ji rîzê ye. Pêvajoya hebûn û tunebûnê ye. Girîngî, dîrokîbûn û neteweyîbûnê di nava xwe de dihewîne. Sedema êrişen li ser me bi vê yekê ve girêdahî ye. Wekî diyar e ji layê Amerika, İsrail û Tirkîyeyê ve, di şexsxiyeta Serokê gişti yê PKK' e Birêz Abdullah Öcalan de di 9' ê kewçêrê de komployek navneteweyî pêk hat. Armanca vê komployê, di şexsê Öcalan de jiholêrakirina Serokatiya gelê kurd bû. Di vê demê de sazûmankarê komploya navneteweyî dîtin ku kêseya kurd di rojeva Ewrûpayê de bûye sermijar û her wiha nav-


neteweyî bûye, kurdên belavbûyî û dostêwan bûne yek. Li hêla din tevî asteng û hewldanê dewletê, kêseya kurd ketiye rojeva cihanê jî. Bêguman bi van rûdan, rejîma faşist ji binî ve hejiya. Dewletê, girseya faşîstên MHP' yî, ku wekî bingeha şerê xwe yê qirêj dibîne, bi talîmat û destûra Mesut Yilmaz xiste nava tevgerê. Lewre girseya faşist berê xwe da partiya me û erîşen hovane li hemberî gelê me pêk anî. Armanca lihevsorkirina gelê kurd û tirk bû. Pişti qirkirinê jî dê bigotina "Ev rûdan reaksiyana gel e". Lê hêzên faşist ji bilî parvekirina rantê, ne xwedî xem û ne jî xwediye "hestêneteweyî" ne. Ji ber vê yekê jî plan û projeyên wan têk cûn, bi tenê bi beşdariya polisan û MHP' yiyan ku ji gelek deveran berhev kiri-bûn, li hemberî me çend êrîş pêk anîn. Divê baş bê zanîn ku iro giraniya kesen li Tirkîyeyê tu xêrê ji vi şerê qirêj nabînin. Kesen ku dibînin jî faşist in û ji duh ve qirêj û genî bûne. Li ser xwînê xwe didin jiyandin û tirsonek in. Xemên wan li ser gelêri û neteweyî nîn

ni. Wekî keriyê pêz tevdigerin. Debeng û ehmeq in û dê têk biçin.

Taybetiyeke din a van êrişan jî, ditîn û ramana sîstema tirk a li hemberî gelê kurd e. Ev sistem, iro kurdên di nav sînorênen xwe de û partiya wan HADEP' e wekî dîl û rehîne dibîne. Li hemberî berzbûn û gesbûna PKK' e dîn û har bûye. Lewre jî dixwaze êriş bibe ser van rehîneyan û tola têkçûna xwe hilîne.

*Wekî diyar e li hemberî êrîş û hewldanê lînçkirinê yên li ser HADEP' i û kurdan rîexistinê sîvîl û demokratik xwe li keriyê danîn û çalakiyên xwe yên ji rîzê jî avêtin pêş. Hün vê helwesta hanê çawa dinirxînin?*

□ Kêseya bingehîn a Tirkîyeyê kêseya kurd e. Lewre jî rejîm heta ku vê kêşeyê çareser neke, nikare bihos-tekê jî bi pêş de here. Helwesta partiyyen siyasi yên muxalîf, saziyên sîvîl û rîexistinê kedkar a ji bo kêseya kurd reng û şewaza wan jî diyar dike. Lê mi-xabin vê dawiyê bi tenê bi rola "se



Bi baweriya Şakar gelê kurd tevî hemû zordarî û çewsandina giran jî ji qada tekoşînê venekîsiyaye û planê dewletê di avê de birine.

Lê pêvajoya ku gelê kurd iro tê de ye, ne pêvajoyeke ji rîzê ye. Pêvajoya hebûn û tunebûnê ye. Girîngî, dîrokîbûn û neteweyîbûnê di nava xwe de dihewîne. Sedema êrişen li ser me bi vê yekê ve girêdahî ye.

meymûnan" nelîstin û her wiha bi pas ve gav avêtin. Bi rastî jî betalkirina çalakiyan, ranegihandina piştgiriyê û bêdengiya wan ji bo wan bêşûdiyeke mezin e.

Zordarî û şîdet mudaxelyea li dijî mîjî ye. Bi darê zorê ji bawerî û idelan dûrxistin, bi sîstêmê ve girêdan, ji bo rûmeta mirovahiyê û ûtopyaya wê hewldaneke sosret û erjeng e. Taybetiyeke din a van êrişan jî, ditîn û ramana sîstema tirk a li hemberî gelê kurd e. Ev sistem, iro kurdên di nav sînorênen xwe de û partiya wan HADEP' e wekî dîl û rehîne dibîne. Li hemberî berzbûn û gesbûna PKK' e dîn û har bûye. Lewre

# ina Xwe ye

jî dixwaze êriş bibe ser van rehîneyan û tola têkçûna xwe hilîne.

*Di rojêñ derbasbûyî de Serokomarê Tirkîyeyê Süleyman Demirel pêşniyara "Hilbijartina 2 Qonaxî" kir. Demirel, ji bo çi û kî ev pêşniyar kir?*

◻ Vê dawiyê siyaseta dewletê bi her awayî li gorî rewşa gelê kurd û HADEP'ê tê meşandin. Her du lingên dewletê ketine ferek sol. Çêbûn û çênebûna hilbijartinan hîna jî ne diyar e. Ji ber ku dewlet li cihê çareseriyê her ku diçe bêçareseriyê bi rôxistin dike. Lewre di warê kêşeya kurd de her ku diçe helwesta xwe ya înkâr û redkirinê berfireh û tundtir dike. Mafê jiyanê nade tu kesî. Bêguman bi "hilbijartina 2 qonaxî" dixwazin rî li ber HADEP'ê bigirin. Lewre pê dizanin ku wê HADEP li seranserê Kurdistanê bi ser bikeve. Bi vê yekê dixwazin partiyêñ dewletperest li hemberî HADEP'ê bikin yek, da ku di hilbijartinê de bi ser nekeve.

Di rastiya xwe de li ser kêşeya kurd di navbera helwesta van partîyan de tu ferq tuneye. Ji ber ku ev partî heta qirikê ketine nava qirêjî û çepeliyê. Di binê banê "Partiya Dewletê" de yekbûna van partîyan pir zor û zehmet e. Divê gelê me baş bizanibe ku ev partiyêñ berxur û kedfiroş ji rastiya gelê kurd dûr in. Li aliye din ger bêhemdi xwe yekîtiyeke bi vî rengî pêk were ji gelê me van partîyan baş nas dike lewre dê pişta stûyê xwe bibînin û planêwan di avê herin.

*Lê Demirel bi van gotinan jî nema û cara dawî jî got: "Ger li cihekî nexweşîyeke etnîkî rû bide, wê ev yek bi xwe re "paqîjiya etnîkî" jî bîne..."*

◻ Divê mirov li naveroka gotinêñ wisa baş bikole. Ev gotin bi tenê ne gotina Demirel e. Navê siyaseta Komara Tirk e, ku ïsal 75. salvegera-xwe pîroz kiriye. Lewre ev gotin jî weki Komara Tirk 75 sali ye. Dibe ku kevtir be jî. Niha ferq ev e: Heta niha qirkirin bi a-wayekî demdirêj û hêdî hêdî dihat meşandin lê jî iro pê ve analîza vê gotinê bi yekcarî û lezginî pêkanîna fitkirinê ye. Gelo sîstema faşîst pê nizane ku em iro gîhiştine dawiya sedsala bîstan? Ev serdem ne serdem 1925'an e û ne jî kurd kurdêñ berê ne. Komara Tirk ne ma dikare bi bêdengî û erzanî komkujiyê Dêrsim û Agirîyan pêk bîne.

*Di pêvajoya dawîn de êdî dewlet ji bo HADEP'ê biryara girtinê nagire lê bi rîbazêñ zordar û li dijî hiqûqê dixwaze HADEP'ê bêxêz û hêz bike. Ci-*

ma?

◻ Polîtikaya fermî ya li ser HADEP'ê diyar e. Pişti partî girtin li serê dewletê bû bela, dewletê dest ji vê rîbazê kişand. Niha çawa dike? Niha dixwaze kelehé ji navê vegire û bi dest bixe. HADEP ci dike ku dibe hedefa êrişan?: HADEP hêvî û daxwazên gel tîne ser zimên, piştgirê doza maf û azadiya gelê kurd e. Bi awayekî din "Demokratîkbûna Rejîmê" ku doza qirkirina gelê kurd dike, berbiçav dike. Bêguman dewletê ji HADEP'êke wisa tengizar û aciz bibe. Doz û daxwaza teslimiyetê hate kirin. Her wiha xwestin rola "İdrîsî Bitlîsî" bi me bidin lîstin.

*Wekî tê zanîn Bülent Ecevit ji bo avakirina hikûmeta nû hate wezîfedarkirin. Ev yek ji aliye derdorêñ kurd ve wekî berdewamiya polîtiya qirkirinê tê nirxandin. Li ser vê dîtina we çi ye?*


◻ Ecevit her dem ji aliye rejîmê ve ji bo figûraniya polîtikayêñ bêyom tê wezîfedarkirin. Ew sazûmankarê Komkujiya Mereşê ye. Polîtikayêñ faşîzan dibe ku demeke din ji layê Ecevit ve werin meşandin. Lî ji niha ve diyar e bêpergalî û aloziya di nava dewletê de dîsa jî ji holê ranabe. Jixwe di hikûmeta 55'an de polîtikayêñ li ser kurdan ji aliye Ecevit ve bi rî ve dihatin birin. Diyar e wê Ecevit polîtikayêñ xwe yêñ li ser jenosîd û qirkirinê di serdema nû de bidomîne.

*Birêz Şakar, hûn dikarin panorama ya Tirkîyeyê berbiçav bînî?*

◻ Jixwe bersiva hemû pirsan di naşa xwe de panoramaya Tirkîyeyê vediye. Di 75. saliya xwe de dewleta tirk ketîye lîreke bêbînî û her diçe li xwe dixe. Ji bo ku wê rizgar bike, li ber

**Ev sîstem, iro kurdêñ di nav sînorêñ xwe de û partiya wan HADEP'ê wekî dil û rehîne dibîne. Li hemberî berzbûn û geşbûna PKK' ê dîn û har bûye. Lewre jî dixwaze êriş bibe ser van rehîneyan û tola têkçûna xwe hilîne.**

destê xwe tu tişt nehiştiye. Destê xwe avêtibe ci herimandiye. Ji çapemeniyê bigire heta zanîngeh, rewşenbîr, partiyêñ siyasî û hwd. Dewletê wekî "yezdanêñ ku dest diavêjin ci dibe zêr" hemû sazî û kes xistine bin xizmeta îdeolojiya fermî û artêşê. Sazûmankarê hemû polîtikayan artêş e. Lewre jî her di-



Şakar bal kişand li ser tirsa dewletê ya bo hilbijartinê û wisa got:

"Bêguman bi 'hilbijartina 2 qonaxî' dixwazin rî li ber HADEP'ê bigirin. Lewre pê dizanin ku wê HADEP li seranserê Kurdistanê bi ser bikeve. Bi vê yekê dixwazin partiyêñ dewletperest li hemberî HADEP'ê bikin yek, da ku di hilbijartinê de bi ser nekeve."

ce alozî û neçarî zêde dibe. Li gorî panoramaya ku tê dîtin li Rojhilata Navîn Amerîka pala xwe dide du tiştan: İsrail Siyonist û Tirkîyeyâ faşist.

Wekî me diyar kir ku kêşeya bingehîn a dewleta tirk kêşeya kurd e. An dê siyaseta xwe bidomîne û têk biçe an ji dê nerm bibe.

*Di hilbijartina li pêşîya me de ji bo Stenbolê hêvî û pêşbinîyêñ we çi ne? Gelo belediyêñ ku hûn bibin desthilatdar hene?*

◻ Rêxistina me ya Stenbolê yek ji

pêgeh û hêza me berfirehtir û xurtir di-be. Bêguman ev yek wê xwe di hilbijartinê ji bide xuyakirin. Jixwe ev demeke dûvedirêj e ji bo hilbijartinê xebat û amadekariyêñ me didomin. A-niha zêde ne rast e, ku navê herêm û belediyêñ ku em bibin desthilatdar diyar bikin. Lî Stenbolê gelek navçe û herêmên ku em ë bi ser kevin, hene.

*We dil heye ji Girtîgeha Ümraniyê bo HADEP'yan mesajeke ragîhînî?*

◻ Ez bi riya Azadiya Welat tevahîya hevrîyêñ xwe û gelê me yê berxwedê silav dikim. Ji ber tevî hemû astengî û zordariyan bi paş ve gav neavêtin. Lewre ez ji dil û can wan pîroz dikim. Evqas zîlm û zordarî nîşana neçariya dewletê û serkeftina gelê me yê welatparêz e. Ez ji dil û can pê bawer im em dê têkoşîna xwe ya watedar û mafdar bibin seri. Li vê derê ez dixwazim gotineke almanan bi bîra gelê me bixim: "Tariya herî dijwar û giran, dema nêzîkbûna ronahîyê ye." Ji bo pêvajoya dîrokî ku em iro tê de ne, em bi dil û can her gav bi we re ne. Em jî gav bi gav di nav can û bedena xwe didin ji-yandin.

SALIHÊ KEVIRBIRÎ  
GIRTÎGEHA ÜMRANIYÊ

# Efsaneyə Dilsoziyê

*"Ev helbesi diyarı ji bo helbestvanê nemir Sebrî Botanî"*  
 Li ser lêva Çemê "Dîcle" y  
 Li serê koçka Harun AL Reşîdî  
 Min tu dîbûy  
 Dema te jiyan ji nû ve dinivîsi  
 Direw peya dikirin  
 Rastî siwar siwar...  
 Min tu dîbûy  
 Li ser Korsiya Ebî Newasî  
 Beramber koçka zordariyê  
 Demen te xemên xwe, bo Dîcley digotin  
 Hêdî...hêdî bi xem dimeşıya  
 Berev jêr, berev xwar  
 Min tu nas kiribûy  
 Û di bîranîn xwe de  
 Tev li livêne te min tomar kiribûn  
 Li serê tev salên nû  
 Şirîniya zaroyan bûy  
 li tev Newrozan agirê Mezloman bûy  
 Min tu nas kiribûy  
 di Çemê Montirê de  
 pêlan ji hemûyan xurtir  
 di ava Mûradê de  
 tu pîremereki deryayî bûy  
 diyariyên zarokan digel te dabûn  
 û li jêr Pira Delal  
 bi çengalên masigir û néçîrvanan  
 dihatî girtin  
 li xîvetgeha Silopiya  
 dîwana azadiyê bûy  
 lêcê...heyhat  
 zemanê wehşiyetê û...  
 darê mosay û...  
 ayetên xapînok

hawkêseka aloz, li ser banê xwe  
 dirust kiriye û  
 régirê hov  
 mirovên nemirov  
 nasnameyên çemên azadiyê dixwa-  
 zin  
 tu dikarî silav key  
 kelha şeda û fertinî  
 ne ez dikarim silav kem  
 pîre dayka di derazînka mirinê de  
 li benda min  
 ne dikarim, di xew de jî  
 fireke ava Kaniya Qesara vexwim  
 Û çavekî li Şikefta Helametan  
 binêrim  
 Na... ne ez dikarim ne tu  
 Çunkî di nav helbesten te de  
 paşmayen şehîdan hatibûn dîtin  
 çunkî awaz û helbesten te  
 bawesînk li birîndaran dikirin û...  
 bûbûn lorika Bedirxan  
 bûbûn nîvîja pîroz a şexê pîran  
 bûbûn çaroka Eşqê  
 li ser serê Bêrîvanan  
 çunkî di nav rezîn helbesten te de  
 peyvîn qedexekirî hatibûn dîtin  
 pasaport jê dihat xwestin  
 di nav wêneyen helbesten te de  
 serkeftinê Heskê Têlî û  
 şopa solên wî  
 li ser gora Etaturkî hatibûn dîtin  
 di nav şeyhana helbesten te de  
 nexşeya tiblîn Zîlanê dihate dîtin  
 dengê Metîn û Cûdî di Dilistana periyan de  
 di nav kezîyen Gulbiharê de

## Xalxalok

Ji berbangê vir de  
 Li ber stargeha min hêwirî  
 Kêzika biharê  
 Dest û piyan bilivîne  
 Xwe bişidîne  
 Ma bibînin  
 Gilazên moriyan  
 Taca seriyan  
 Rastmala bedewiyan

De rabe  
 Çiya û deştan tev de  
 Mizgîneke bîne,  
 Bi kilên binevşê birengîne  
 Binê!  
 Li hesinên girtîgehê bar ke  
 Ez vereşînim  
 birêsim  
 Ji te re bikim hêlik û hêlin

Sosikê,  
 Dora te ne dîwar in  
 Derî û pace

Ser te negirtine  
 Çîma melisi, xewar î  
 Xalxalokê,  
 Here  
 Li Navqedexeya min  
 Dewlek av bîne,  
 Gola Wanê Wirmiyê  
 Dîjle û Ferat  
 Her du Zêyan têxe

Dil û gurçikên min derxe  
 Deyne ser bişangan  
 Xwe berde nav  
 Mîna qulînga avî  
 Bi naz û hez  
 Ajne ke  
 Ajne ke!

## Estanikê Koyanê Berzan

Kuçêkê Amede de  
 Kiyêke diçime  
 Bawê, dayî û pa yê di wayî  
 O,

Hema newe kewtibi pancine  
 Qamêka wesarine  
 Çimêkê esmaninî sero bî  
 O,  
 Hêvî bi...  
 Siweyna;  
 Bay ê şîne kar  
 Şanwanan;  
 Destan de wer, pêwer  
 Ageyrena miyanê kulfetî.  
 Rakewtişan;  
 È,  
 Sere nayne çokanê bay xo ser  
 Bay ê,  
 Her tim ê rê  
 Estanikê derg e  
 Zaf, zaf derg e vatêne.  
 Estanike de;  
 "Koyê berzi, gelîyê xorî,  
 Awa zelal e, adir o gur û gunê gerî-  
 la" bibî...  
 Hewna, vereşanêk;  
 Gama bay ê ageyrayne kiye  
 "Faile yê Meçhûl" yew gule teqa...  
 Wer, pêwer û gunî kewtî têmiyan



Sebrî Botanî, digel Cegerxwîn û lawê xwe tê dîtin.

nav û deng  
**Pira Delal:** Li Zaxoyê pireke dîrokî  
**Xîvetgeh:** kamp  
**Koçik:** sera, diwan  
**Keleha Şeda û Fertinî:** Du kelehen sirûştin li bajarê Dihokê Kaniya Qesara, Şikefta Helametan: Du cihê dîrokî na li bajarê Dihokê  
**Hiskê Têlî:** Qehremanê Şoreşa Agiri  
**Zemanê deben û lewçan:** S. Botani ev gotine pir digotin.

Yew dara çinêyere qelewiya  
 Yew cînîviya û di wayê sêwri  
 Û o,  
 Hendî miyanê  
 "Estanikê Koyanê Berzan" de bi...  
 ROŞAN LEZGİN

## Bi Kezeba Şewat

Her ku keleşa di destê şervanên min  
 de radiweste  
 Gemarî dibe û zengar lê diçêre  
 Her ku ez welat dibînim  
 Di bin ala dagirkieran de  
 Kul û derd û êş li dilê min diçêre  
 Wê çaxê ez jî bi kezeba şewiti  
 Li helbesta xwe diçêrim...  
 FATİH BENDEWAR

Navenda Canda Mezopotamyayê ya Îzmîrê

● 19.12.98, şemî:

Konsera Koma Azad "Şemal", saet: 18.00

● 20.12.98, yekşem:

Konsera Kosera Koma Azad "Şemal", saet: 18.00

● 21.12.98, duşem:

"Roja bazarvaniyan", Konsera Koma Azad, saet: 18.00

● 23.12.98, çarşem:

Konferans: Qetfâma Mereşê. Hüseyin Ozan, A.Celil Demir, saet: 18.00

## ÇALAKIYÊN HEFTEYÎ



YÇKM

● 19.12.98, şemî: Film: "Li Cülemêrgê demsaled". Derhêner: Erdal Kiral, saet: 16.00

● 20.12.98, yekşem: Bi zimanê huner mirov û civak "Dertolt Brecht û tiyatroya epik". Pêşkêşvan: Nazif Uslu. Beşdar: Zeliha Berksoy, saet: 15.00

Pêşandana tiyatroye: "Tiyatro Manga"

Navî lîstikê: Çekê Carrarê. Nivîskar: Bertolt Brecht. Rêveber: Halit

Karaata, saet: 17.00

● 25.12.98, in: Çalakiyên Navenda Çanda Mezopotamya, saet: 17.00

Perwerdehiyek alternatif û nêzî gel

# Zanîngeha Azad

Zanîngeha Azad Pişî Enqereyê, li Stenbol, Îzmîr, Îzmît şaxên wê hatin vekirin, niha jî xebata vekirina şaxa Amedê dest pê kiriye.

**Z**anîngeha azad, di sala 1994'an de di bin serkêsiya Dr. İsmail Beşikçi, Prof. Fikret Başkaya, Prof. Yalçın Küçük de li Enquerê hate damezi-randin. Armanca Zanîngeha Azad, eve ku rewşenbîriya ku di bin bandora Ewrûpayê de maye ji holê rake, gel li dijî împêryalîzma Ewrûpa û Amerîkayê bi-parêze, bi vî awayî perwerdehiyekke alternatif pêk bîne.

Zanîngeha Azad roj bi roj sazibûna xwe bi pêş dixe. Pêşî li Enqereyê dûv re li Stenbol, Îzmîr, Îzmît şaxên wê hatin vekirin. Niha jî xebata vekirina şaxa Amedê dest pê kiriye.

Zanîngeha Azad bi giştî xwediyê dused perwerdekar û hezar û pêncsed xwendekaran e. Mirov dikare bibêje perwerdekarên zanîngehê kesen müxâlîf in. Li gorî perwerdekarên Zanîngeha Azad ên Stenbolê, aloziya nasnamaya rewşenbîran heye, gerek rewşenbîr xwe ji Kolana Îstîklalê rizgar bike û bi gel re hev du nas bike.

Zanîngeha Azad xebatê xwe li ser navê Weqfa Forûma Tirkîyeyê û Rojhilata Navîn bi serokatiya Fikret Başkaya didomîne. Di danasîna sazkirinê de armanca xwe wiha tîne zimên. "Mirovahî dikeve salên sêhezaran. Wê mirovahî astengiyê li pêşîya demokrasî û aşıtiyê ji hole rake. Ev dereweke gelekî mezin e. Ev êrîşa Ewrûpayê ye, ev bîrdoziya kapitalizmê ye. Ev politikaya gerdûnîbûnê ye. Bi vî armancê di serî de çapemenî û hacetê kapitalizmê, mirovahîye û rewşenbîran dixapîn. Armanca wê ya herî mezin ev e; mirov ji pratîka dîrokê dûr bixe. Gerek ev politîka têk biçe. Di serî de pêwîstiya mezin, perwerdehiyekke alternatif û nêzî gel e."

Tê diyarkirin ku Zanîngeha Azad dibistana karkeran a Ewrûpayê ji xwe re mînak gitte. Dibistana George Politzer. Tekîliyên li zanîngehê ne bi awayekî mamoste-sagirt ne. Bi besdariya her du aliyan ders tê dayin. Bi vî awayî perwerdekar jî xwendekar jî têdigihîje. Xwendekar kîjan dersê bixwaze, wê dersê distîne.

Zanîngeha Azad, xwe bi berhemên zanîngehê finanse dike; Wekî Forûma Rojhilata Navîn, Bakış û pirtûkîn li ser zanîngehê çap dibin. Berpirsê Zanîngeha Azad yê Stenbolê



Mirov nikare bibêje zanîngehê sazibûna xwe bi awayekî xurt bi cih aniye. Em hêvî dîkin lê hîn kêmasyîn mezin di her warî de hene. Di nav perwerdekar û xwendekarên me de ji her fikir û ramanê mirov hene, ji bo tekîliyên dostanî ev hîc nebûye asteng. Gerek di serî de rewşenbîr û perwerdekar xwe ji çanda barê azad bikin. Heta ew nebe, mirov nikare qala rewşenbîriyê û piştgiriya proletarya bîke."

Li gorî Zanîngehê, Tirkîye gerek sê kêşeyen sereke çareser bike, yek; pirsgirêka kurd, maşen mirovan, aborî.

Ligel ku ji yên li bajarê din pir cûdahiyek di nav wan de tune ye, dersên li Zanîngeha Azad a Stenbolê tên dayîn ev in: "Aborî-polîtik û aloziya kapitalizmê ya dawîn," "Li Tirkîyeyê pêşketina kapitalizmê," "Dîroka kedê û analîzîn dewletê," "Marksizm û psî-kanalîz," "Dîroka hunerê," "Rojhilata Navîn," "Li Tirkîyeyê û cîhanê çep," "Çavkanîyen maşen mirovan ên navneteweyî," "Di têkoşîna civakî de jin," "Pirsgirêken mirov nû."


Li Zanîngeha Azad dersdayîn dibin du ser navan de hatine vejetandin, wekî "Dema Pa-yizê" û "Dema Havînê."

Li Zanîngeha Azad a Stenbolê her sal sê perwerdekar, sê xwendekar û mirovек ji weqfî ji bo rîvebîriya zanîngehê bi awayî pişkî têne hilbijartîn. Bi vî şikli hem xwendekar hem jî perwerdekar besdarî karê rîveberiyê dibin.

AZADIYA WELAT /STENBOL

## TİŞK

Kurd û Emerîka



BEKIR ŞİWANÎ

**L**egel nizîkbûnewey hezarey duwem û seretay sedey bist û yekem da, kêşekeman, wate letûpetbûnî welatman û negeliştinî neteweyekî 40 milyon kesî be azadî, babetêkî serekî siyasetî dagîrkeranî Kurdistan û hemû ew layen û dewletane ye ke le nizîk û dûrewe peywendiyan be kêşey kurdewe heye.

Egerr le bazney dagîrkeranî Kurdistan derbiçîn û le goşenîgây derewewe seyrî qonaxî diway derçûnî Serokî Giştî PKK A. Öcalan bo Roma bikeyin, nakokî û dübendiyekî zor aşkira debînîn le néwan boçûnî Emerîka da sebaret be kêşey kurd le herdû parçey Kurdistan le Bakur û Başûr. Helbet mêtû em nakokiye taze niye û lem maweye da dirust nebûwe, belkû kon e û hoy taybetî xoy heye, belam ewe heye ke legel gewrebûnewey kêşey netewekeman da idî leyenekanî naçar debin helwêstî xoyan lemer ême rûntir bikenewe çünke rewş wa dexwazê.

Gumanî têda niye ke Emerîka le çiwarçêwey berjewendî xoy da helsûkewt legel babete nêwdewletiyekan dekat û em bare kêşekî êmeş degrêtewê. Emerîka siyasetêkî dûruwana derheq be kurdî Bakur û kurdî Başûr peyrew dekat. Le ber ewey dij be rijêmî Saddam Hûsîn e, amêz bo kurdî başûr dekatewe û hewil dedat nakokî nêwanyan çereser bikat û hawkariyan dekat ke qewareyekî taybet bo xoyan damezrînin. Hanyan dedat dij be rijêmî Baxdad rawestin û helsûkewtî legel neken, bêguman hemûman demanewê kurd hîc peywendî be rijêmî Iraqe nemênê û le aşîfî û aramî da bijî û berew serbexoyn û damezrandînî dewlet hengaw binê. Lîres da berjewenî kurd ê Emerîka yet degrêtewê û karî hawbeş deken, em helwêstêy Washington cêgay rîz e eger le beskî tirî welatî dagîrkarîwî ême siyasetêkî pêçewane perew nekat. Mebestim bakurî Kurdistan e, eweta Emerîka têkoşanî reway gelêkî 20 milyon kesî serûy Kurdistan be tîror naw debat, her le ber ewey Turkiye hawpeymanî Emerîka ye le Peymanî NATO da. Emerîka mawey 15 sal e çawpoşî dekat le sotandin û kawilkirdinî gundekanî bakûrî Kurdistan û kuştin û derbederkirdinî danîştanî û be hîc corê gûşar naxate ser Ankara ta dest le siyasetî qirkirdinî gelî kurd helbigrê. Estaş ke kêşey kurd pêy nawete qonaxêkî tir û le Ewropa deng berz dekrêtewê bo dozînewey çareserîkî aşîfî û siyasi em kêşeye, Washington lebirî ewey gûşar bixate ser Ankara û razî bikat xoy leçareser kirdinî kêşey kurd nizîk bikatwe, ke çî debînî le pişt Ankarawê radewestê û heman helwêstî Turkiye dubare dekatewe. Ca eger eme durûyi û kurd witenî siyasetî (Banêk û Dû hewa) nebê, ey ci ye?! Bawer nakem hîc kurdekî xawen bîrî neteweyî û mirovayetî bewe razî ke beskî zorî gelê kurd û mezintirîn parçey kurdistan bikrê be koçî qurbanî bo siyaset û berjewendiyekanî Emerîka û welatanî rojawa.

Dawakiraw le çînî roşinbîran û niştimanperweran û liheze siyasiyekanî Kurdistan û heman kat be hemû şeweyek gûşar bixene ser Emerîka ta be yek çaw temاشay kurd bikat û le çareserkirdinî kêşey kurd da le bakurî Kurdistan hawkarî bikat û çî dî nehîlê beber çawî sertapay cîhanewe gelêkî bêcek qir bikrê.

# Destana Seyrê û Eliyê Mamed

**Q**or Hesen, Qor Mehmed, Qor bi-rayê hev bûn, di welatê Hesen û Heydera de bûn. Motik morîka bitir i têr bûn, te malê wan bavête avê wê ava çeman biçikanda. Xwiheke wan hebû, nav û dengê wê li belîta welatan, li welatan, li şaristanan, bila camêr ji Heyderan ne çêtir, li der û dinyayê belav bûbû. Navê wê re de digitin Seyrê.

Yeke çawa bû?

Yeke Nimzek e, xan menzîl e, kemal kîroşk e, biz bi têl e, pêşmal şîn e, ser bi zêr e, sing û berê wê komalê komalbavê, spîne, berfa ciyanan ku bikeve Zozanê Şerefedîn e. Şeva kete nîvê şevê û pê de yek boz li ser sing û berê Xatûna sêngspî ku ji xwe re bîne Ceneta Baqî, ez herim koçeriyê, sêva qesartî di bogaza kumalê kumalbavê te daniye, sibhan jê re geylan tu dibê qey kîvroşkê birije, navqa xwe ji xezalê diciye. Şewq û şemala heye ji diavêje çol û ciyan, davêje ber behrê pişta gamasiyan. Mewîjê dixwe, ji qirikê heta navqê xuya dike, tu dibê ya rebî Xwedê bixwe bixwe, ji xwe re li vê xezalê meyzîne.

Ji nav bajarê Farqînê du caran sê caran sandin heta qırsa ser cila wan kirin. Ji évara Xwedê de heb heba serê şekir dişkînîn fincana qehwê dihilfîrîn. Axê bi kêt û esqê di odê de dibin û tînîn. Heçî keçik e, destê wê ji erzaqan, ji xwarinê, ji teklikê vala nebû, ha ha dişînîn wî aliyê odê. Kêliya şewqê di qerebangê şevê û pê de, şev qar bû, got bi Xwedê û pêxember heçî misafîrî birayê min in, cemal in, ezê meyzînim ka hatina wan ji bo çi ye gelo?

Ji xwe re rûnişte li ber şibakê li ser şibakê pêl kirin û meyzîndîn, jixwe wilo hesîsî serê ştexaliyê binê ştexaliyê wana gotina keçikê anî meydanê. Got birûz di bavê kerê de. Ez vî qasî min ji xwe re bêvíla xwe heridandiye ji Beglerê Farqînê re.

Heçî keçik e asîl e, kurapekî wê heye, jê re dibêjin Eliyê Mamed. Ahl û qenemîşê pepûko tunîne. Di wê mişî mala wî de bi ar nabe. Pirek diya wî heye, sal çûne meh mane, meh çûne roj mane. Li ber qe-derekê li ber pîfekî ye. Mal û mewdânê wî ku heye, bizineke wî heye, bi çavekî ye, ev qasî zengîn e. Haveynê mitqalkî qelen di hûçkê pepûko de nîn e. Keçikê got rebî ma ev jî li darê dinyayê heye, ku destê min û Eliyê Mamed kurapê min, ji hevdû qut bibe. Hema çawa be, şas be, seqet be, bawî be, kurapê min e û ji agîre bavê min e. Carekê ku biqewime stûnka hesinî, ji û kezebê pişta hersê birayê min e. Hema çawa be, ji Beglerê Farqînê miqedim tir e.

Keçikê devê xwe kir bin guhê pîrka xwelîserî, got: "Pîrê!" Got: "Çî!" Got: "Ez di bextê te û Xwedê de tu bi kérî qasidê-kî nayê pîrê?" Got: "Hew lawo devera ku ez lê me hedê bavê kê ye. Pîrê!" Got: "Çî!" Got: "Ez di bextê te û Xwedê de, xwe bi mala Eliyê Mamed bigihîne. Bê Eli şûrê te qusandîye, ku qusandîye, destê te di ava sar û germ de be, ji du saetan ber jor ve wele ji te re nema, ez ji destê te çûm."

Pîrê ji dawma xwe de rabû, bereketa Xwedê lê be, bi loka guran, bi teleba ke-

ran. Geh li vir û gel li wir, xwezka bi mala Eliyê Mihemedkê. Bê keçikê çi jê re gotibû, bi dev jê re got, ew ji dawma xwe de rabû. Bi rebê alemê got îcab heye ku carêkê çavê min bi saxî li heyata dinyayê nekeve. Wê bêje kurê apê, ma ne min şand û tu nehatî, ji dawma xwe de rabû, bi zelûlî, bi keşkûlî; mexlûm e, feqîr zingara mîra ye, Xwedê teala neyne serê tu kurê bavan. Camêro ji hazira ne çêtir. Kûrik ji dawma xwe de rabû bi dilekî kul û şkestî, heta lê xist de li vir û de li wir, dûrî vê hizûrê dibêjin şewta pîreka zêde ye. Keçik berî wî hate civanê xwe.

Keçikê halo meyizand ku kurapê wê ji wê de tê. Xwe dixelîne vî milî û milê din. Got bi rebê alemê heçî ku kurapê min e, zarê reşî be, nû xeta simbelan rast kiriye. Fihêd dike. Ez ê şerma kurapê xwe şkînîm.

Seyrê bang kirê got: Pismamo Heyderîne, dinya mîrat e derewîn e, ezê gotinkê bêjîm, nebêje dotmama mardîn e, agir bi mala bavê te neketo, ev qas girêkê me di qehwa de rûniştî ne, rabin bi çepîle Seyra Gulîsor bigirin ji welatê Hesen û Heyderan, min birevîne. Ax looo looo looo pismamo!

Ewî bang kir got: Dotmamê dem nabe, melek daxîlî erda bin, fermân ji derikê Stenbolê li me rabe, tu zanî haveynê menqelkî bi qul, qelenê te ji min çenâbe, dûvî miskê li mala min bi ard nade, ay Seyrê.

Seyrê bang kir got: Pismamo hey li min hay li mi hayê, mala kîfa der û dinyayê, heyam çûyeee, bexîl nayê, qîma Seyra porkur bi te tê, qîma te bi Seyra dotmam nayê. Loo looo pismamo, ax lo dotmam bi gorî!

Qasî wilo got, Eliyê Mamed ji dawma xwe de rabû piyan. Bi mala apê xwe de bezîya, hespîkê mîvana bijart û anîye, ewî pê girt û anî bi çepîle Seyra Gulîsor girt û li pişt xwe daniye.

Seyrê bi deva gotê: Pismamo min bavêje hemika derika ji bav û kalê xwe de em qîmzirav in li ber barê xwînîyan. Ewî bang kir got: Dotmamê Heyderîne, wekî ez zillam im, tu pirek î, tu li pey min, tu eleqê te jê nîn e. Lé lê lê Seyrê, ax lê lê dotmamê! Lé lê dotmamê mîadê berê kurapî kirîvîkî me hebû, li quntara Çiyayê Evdilezîz, ji bav û kalan de kirîvî me yî xwînî ye, jê re dibêjin Hiseynê Dogbelê ne.

Eliyê Mamed ji dawma xwe de rabû bi çepîle Seyra Gulîsor girt û li pişt xwe daniye. Ya ew e ya Xwedê, kete binê Neylana Col Biriye, Eli kete dora Golê Gemîyan, di Şengalê de bi xwe ve çûyiye, di Xale Zibil, di Xîrbê Xezalan qulupkiye, di Şûva Reşa xiriciye, di ser Bîra Gurgurî derbas bûye, li ser Bîra Xêredînê sêpek av vexwariye. Eli kete Çiyayê Reş, Çiyayê Ezidî ye. Beyêm li demê li dewranê, li vê ecêbê li vê tofanê, diçe ku Hiseynê kirîvî xwe Hiseynê Dogbelê bigere, ema bi şasîti dikeve bin konê İskanê Gulîxanê ax lo lo looo! Dotmam bi gorî.

Eli bi çepîle Seyra Gulîsor girt û kete bin konê. Got çaxê te bi xêr kirîvo. Got bi xêr bi silamet li ser çavê min û bavê

Ev destan ji salan ve ye tê gotin. Ev destana bi navê Çiroka Seyre bi piranî li Herêma Botanê bi nav û deng e. Me ji kaseta ku ji aliyê M. Eli ve bi strankî hatiye gotin, girt.



min hatiye xertê Hiseyniya. Kirîvo min ji zû de bêriya Hiseyniyan kiriye eman got kirîvo min tiştekî li deriyê rê kiriye.

Got çawa ?

Got min bi çepîle Seyra Gulîsor girtiye, revandiye. Tiştekî ez pê hatime min bîhstiye hey lolo loo!

Di qelbê xwe de İskanê Gulîxanê mal-sevitmi got li vê ecêbê li vê dewranê ez li ezmanê heftan li Seyra Gulîsor digeriym, halê hazir li erdan kete ber destâ û lepiya. Xwedan fermana min ranekê, Xwedê rihê min nestîne, ezê bikujim, serê Seyra Gulîsor mahr bikim li vî caniya lo lo de ax lo heyloo.

Di qelbê xwe de got, bavo Heyderîne, heçî mîrkê Hiseynê, kurmê darê ne ji darê be haya kesî bi wan tunîne, bavo ev ci dem e ev ci dewran e eee!

Bang kirê sê xortê İskane xwe berjêr kire binê hawiza leyelan e, heta anî melakî misilman e. Li ber çoka wî rîniştîye got: "Wa Seyda!" Got: "Libê çi ye?" Wele ez li ezmanê heftan li Seyra Gulîsor digeriym, helal hazir li erda ket ber dest û lepiya min divê bi te re bişînim sê xortê İskana piçekî ku bi eksî ye. Du keliya çû wî aliyê çû dawî ye. Çav kire xortê yeziðî ye, min divê wî xortî li xinceran bixin, Seyrê mahr bikin li vî caniya lo lo lo loo ax lo hey lo lo ax!

Ewî bang kir got. Kirîvo hewce nîne. Got hema ji vir û ha de eleqa te jê nî ne, hey lo lo lo de lo kirîvo loo!

Mele ji dawma xwe de rabû, kitêba xwe di bin çengê xwe de zemp kiriye, rî nîşan da sê xortê İskana piçekî ku bi eksî ye, sê keliya çû vî aliye çû dawî ye. Mele kitêba xwe derxist û sê saetan jê re nesihat kiriye, İskanê Gulîxanê dêhna bidê, mabû li devê deriye, eman dîhna xwe bidê Eliyê Mamed bang kir got: Seyda de weye got tu ji min re bêfêde ye. Elhemdülîlah em zanin ku dînê heq dînê me ye hey lo looo!

Melê got: Lawo ezê rabim, yeke pak im, ezê bi wê Qurana heq zelal kim, işev ezê li Çiyayê İskana dotmama te li te mahr kim. De lo lo ax de lo lo hey lo lo! Ema lawo de tune, Alif axa paşakî pir mezin i, tu kanî destê rastê bide destê min e. Qasî behsa destê rastê kiriye, Seyrê anîşka xwe li ya wî xistiye, ewî destê çepê da-

bû destê wî ye.

Mele bang kirê got lawo dem nabe, ferman ji derikê Stenbolê li me rabe, di dînê me de destê çepê qebûl nabe.

Got: Seyda de hêye, em hêviya xwe di-kin ji Xwedê ye, belkî Ellah Xwedê teala li vê dinyayê li wê dinyayê min efû bike ye, işev di dînê me de destê çepê qebûl bibê ye.

Melê kir û nekir tiştek jê fam nekiriye, ewî destê çepê qenc bi qîmê zept kiriye, çav kire xortê yeziðî ye. Melê gote wî deqezâ kiriye, heta dotmama wî lê nîkeh kiriye lo lo ax de loo!

Mele ji dawma xwe de rabû piyan, pişta xwe rast kir û der qûna xwe weşandîye, çû İskanê Gulîxanê kiriye, ev gotin û galgal jê re gotiye.

Erê got: Kirîvo de tune, min kir û nekir destê rastê nedâ destê min e, min destê çepê qenc bi qîmê zept kiriye, çav kire xortê yeziðî ye, kesî bav û bâpîrê xwe bi bîra xwe neaniye.

İskanê Gulîxanê malikşewitî, got: Seyda ezê rabim lez kim, bileyñim. Bi Şêx Hadî, Melekê Tawiz kim, ezê di işev de rihe te di kortika milê te de biderînim. Heçî mele ne, esas xayîn in. Mele got: Tu zanî çi ye? Got: Çî? Got: çima hûnê min bikujin? Got çawa? Got: Xort û qîzînaha ji welatê Hesen û Heyderan hevdû revandine tiştek nayê bîra wan, wê niha zendê weke berfa zozanân di bin serê hev re derbas kin, bîkevin xewa şerîn. Kêliya ku di xew re çûn, ezê şûrê xwe bi xirm û li ser kirkirka dîlê wî bixim. Heta ku bi temar nekim, wey li min heram be ku ji vî welatî ji vî meskenî herim.

Seyda got: Bi vî rebê alemê, kesî şîretek wekî ya te li min nekiriye, iro begê min dînîhêre, ji évara Xwedê de dîhna xwe bide İskanê Gulîxanê malikşewitî, weke mirîşkan hêk pê re. Ewî lingê xwe deranî. De de bi qelebîska çûyiye. Meyîzandîna ku meyizand, heqîqeten wekî zendê weke berfa zozanân di bin serê hev re derbas kiriye. Xir xir li qırka wan ketiye. Dêhna xwe bide İskanê Gulîxanê malikşewitî ye go çip û qulupke koza wî ye, çû li ber serê Eliyê Mamed lawkê rîwî rûniştîye, hey lo lo loo! (Dê bidome)


BERHEVKAR: EVİN RONI

# Hejmara 28'an a Nûdemê derket

Kovara çand û hunerî Nûdem bi hejmareke nû derket pêşberî xwendevanê xwe. Ew hejmara ji sergotara ku ji hêla Firat Ceweri ve hatiye nivîsandin dest pê dike. Di vê sergotarê de Ceweri li ser rewşenbîrê kurd Sebrî Botanî ku berî niha bi demeke kin koça xwe ya dawîn kiribû, radiweste. Ceweri çeli têkiliya xwe û Botanî dike û li ser rewşenbîriya Botanî, hêvi û daxwazén wi çend têbinîyan rêt dike. Her weki té zanîn Botanî nivîskarekî Nûdemê bû û nivîsên wî yên li ser mijarén cur bi cur di nav rûpelên kovarê de cih girtibû. Pişti vê gotarê wêneyekî Botanî û helbesteke wî jî cih girtiye.

Li pey vê nivîsê çirokeke balkêş a Ferhad Shakely té. Ew çirok ji hêla Elîser ve ji zaravayê soranî bo zaravayê kurmancî hatiye lêanîn. Di nava çiroka bi sernavê "Term" de serpêhatiya xortekî heye ku digel bavê xwe dest bi rêuwingiyekî dike û di rê de bavê wî dimire, ew ji bêgavî termê bavê xwe bi xwe re digerîne. Li dûv vê nivîsê wergera teksteke dîrokî "Şîretîn Ahîqar" hatiye. Wergera van şiretan ji hêla Hemîd Kılıçaslan ve ji tirkî hatiye kirin.

Bîranînê Refiq Hilmî di bin sernavê "Bîranînê min" de di vê hejmara de jî didomin. Refiq Hilmî di vê besê de li ser jiyana Şêx Mehmûd dinivise. Léâlinâ vê nivîsê bo zaravayê kurmancî ji hêla Ziya Avcı ve hatiye kirin. Dê ev nivîs bo kesen ku dixwazin Şêx Mehmûd ji nêzîk ve binasin südewar be. Bi tay-



betî têkiliya di navbera bavê Şêx Mehmûd Şêx Se'id û Padışahê Osmanî Eb dulhemîd de hêjayî dabaşkirinê ye.

Di nava vê hejmara kovarê de şano-yeke Celadet Alî Bedir-Xan ji cih girtiye. Ew lîstika bi navê "Hevind" ji hejmara 29'an a kovara Hawarê hatiye wergirtin. Pişti vê nivîsê, N. Zaxuranî li ser "Felsefe û edebiyat"ê radiweste. Zaxuranî têkiliya felsefe û edebiyatê hildaye dest. Wî, di vî warî de dîtin û ramânê filozofan rêt kirine û bi alikari-

ya wan mirov tê digihêje ku di domana dîrokê de ev têkili bi çi awayî hatiye şirovekirin. Bonimûne, Arîstoteles û Platon hunerê mîna lasayîkirina diyardeyê reng xwezayî dibînin. Pişti vê nivîsa hunerî-lêkolînî, beşa sêyemîn a danasına Olof Palme cih digire. Her weki nivîsên berî niha yên bi vî rengi, ew nivîs ji hêla Mihemed Dehsîwar ve hatiye amadekirin. Li dûv vê nivîsê çiroka Guy de Maupassant a bi navê "Sîwan" té. Ev çiroka ku li ser çikûsiya jinekê û mîrê wê radiweste, ji hêla Serdar Roşan ve ji Swêdî hatiye wergerandin. Şiroveya Dîwana Melayê Cizîrî ku di hejmara din a Nûdemê de dest pê kiri-bû di vê hejmara de jî didome. Emîn Nardozi xebata Mele Ehmedê Zivingî ji erebî werdigerîne.

Ji bili van nivîsan, nivîsa Dilbixwîn Dara ya bi navê "Di romanê de xeyal û teswîr", nivîsa Laleş Qaso ya bi navê "Beşek ji romana sê şev û sê roj", Çiroka Şerefhan Cizîrî ya bi navê "Mêrxasiya Müso" çend nivîsên hêjayî dabaşkirinê ne. Helbestên kesen mîna Cemil Denli, H. Kovan Baqî, Rênas Jîyan, Arjen Arî û Edip Cansever di vê hejmara kovarê de hatine weşandin.

Di dawiya kovarê de danasına ber-

hemên nûhatiye heye. Rojen Bernas di bin sernavê "Şerefnameya bi kurmanci û bîra me ya millî" de wergera kurmanci ya Şerefnameyê dinirxîne. Bernas bi taybetî balê dikişine ser vê yekê ku yekemîn car e ev berhem li zaravayê kurmancî hatiye wergerandin. Rojen Bernas digel nirxandina berhemê, balê dikişine ser nirxên neteweyî yên mîna vê pirtükê û hestêneteweyî. Ev werger ji hêla Ziya Avcı ev hatiye kirin. Xwendevanê Nûdemê yên domdar dizanîn ku berê jî çend nivîsên Avcı li ser vê berhemê di nava rûpelên kovarê de habîbûn weşandin.


Danasına duyemîn ji hêla Şerefhan Cizîrî ve hatiye kirin. Cizîrî pirtûka Mehmed Uzun a bi navê "Dengbêjlerim" di bin sernavê "Dengbêjîn Mehmed Uzun" de hildide dest û hinek rexneyan arasteyî berhemê û nivîskarê wê dike. Şerefhan Cizîrî pêşî rîbaza nivîsandina berhemê rexne dike û dide zanîn ku Mehmed Uzun ji dengbêjan zêdetir, li ser têkiliyên xwe yên bi van dengbêjan re rawestiyaye. Her wiha, Cizîrî balê dikişine ser zimanê ku pê berhem hatiye nivîsîn û pêwîstiya nivîsandina bi zimanê kurdî tîne zîmîn. Cizîrî di vê danasînê de çeli hinek agahiyyê çewt jî dike û bo vê yekê jî nivîskar rexne dike.

Ji bilî van berheman di dawiya kovarê de danasîna gelek berhemîn din jî heye.

SERWÎSA ÇANDÊ

## Qetlîama Eleqemsê û mehmekemeya tîrkan

HASAN KAYA



Dema ku ez biçük bûm, derwêşan bi erbanê stranek digot. Çend gotinê ku a niha ji wê stranê têne bîra min ev in: "Wan wehşen kurê wehşan Agir berdane laşan"...

Ev stran li ser qirkirin û şkestina Eleqemsê dihate gotin. Eleqemsê gundekî li ser Hezexa Mêrdinê ye. Heta niha ji bili nivîsek duduyan pê ve di heqê vê tevkuiyê de, li tu cihan ez rastî tu malûmatan nehatim. Malûmaten min jî yên dema zarokatiya min in. Ew malûmaten ku bapîrê min û çend camêren din di civatan de digotin û ew strana bi şewat a derwêşan li ser hişê min mane. Kêmasiyek e ku heta niha min ev qetlîam venekolayê û nebûme xwedîyiye agahiyyê têkûz. Van rojan pişti ku doza kurdan li cîhanê hate axaftin û gotin hate ser qetlîamê ku osmaniyan û tîrkan pêk anîne, ev bûyer hate bîra min. Li gorî ku tê bîra min ev bûyer weha qewjimiye:

Bi texmîna min sal der û dora 1925'an bûye. Wê demê li herêmeke Kurdistanê raprînek hebûye. Gundên der û dora Hezexê jî

dixwazin ku qereqolên der û dorê ji herêma xwe derxin. Jixwe wê demê hindik qereqol hebûne. Diavêjin ser qereqola Eleqemsê. Tîvingên leşkeran ji wan distînîn û wan ber di din. Pişti ku xeber diçe qolordiyê û pê dihezin ku kurdan bi ser qereqola Eleqmesê de girtiye, eskerekî giran dişînîn wê herême.

Kalên ku ev bûyer bi çavên xwe dîtbûn, roja wehşetê weha vedigotin: Rojeke ku şili û şapê dîbarî bû. Ji teyareyan belavok hatin avêtin. Di belavokan de dihate gotin ku bila mîr bi tevî çekên xwe, berdest bibin, hikmetê efû derxistiye. Topiskek jî li tu kesî nayê dan. Fermandar li gundan geriyan. Fermandarê herî mezin mirovekî çavşîn bû. Ji hinek gundan re hate gotin ku bila ew kincekî spî bi serê darekî ve bizeliqînîn û li ser ban daçikîn. Paşê hat fêmkirin ku ewen ku paçê spî daleqandin alîgîrê dewletê bûn. Ji bo ku bi çewtî leşker zîyanê negîhîjîne wan, ji wan re hatîbû gotin aleke spî li ser banê xwe daçikîn.

Leşkeran mirovên sêzde-çardeh gundan li bêndera keviya Eleqemsê kom kirin. Gelek kes teslim nebûn; berê xwe dane binxetê (sûrî). Hinek teslim bûn û hinek hatin girtin. Mêr, zaro û jin jî hev hatin vegetandin. Têlêke bi dirî li dora wan pêçan û ew gulebaran kirin. Pişti ku gulebaran kirin, donê gazê bi ser wan de reşandin û agir berdane laşan. Bi taybetî mîr kuştin lê gelek jin û zarok jî hatin getirkirin.

Ew gotina ku di stranê de derbas dibû, "wan wehşan agir berda laşan" ji wir dihat. Dema ku Sofî Nûrî bûyera Eleqemsê digot, bi taybetî di binê bandora du tiştan de dima. Yek jê, dema ku têlê li dora mirovan dipêçin, jinek têdîgîhîje ku dê bêne kuştin, ji ber wê yekê zaroka xwe dide qomitanê tîrkan. Dibêje: ji bo xwedê vê sebiyê nekuji. Fermandar zarokê dide ber singoyan. Sofî Nûrî digot roviyên zarokê derketin derve. Zarok nemir û bi roviyên xwe leyist. Ya duyemîn ev bû, dihat gotin ku laşê mirovên ku hatibûn sotin sip û spî bû. Mîna kefen bû. Sofî Nûrî digot ji ber ku ew şehîd bûn lewre laşê wan weha spî bûbû. Jixwe bêkefen hatine veşartin. Di vê bûyêre de pir hindik mirovên ku di binê laşan de mabûn birîndar xelas bûbûn. Di rojîn li pêşîya me de mirov dikare bi awayekî zanîstî, bi belge û bi alikariya şahidan vê qetlîamê vekolê.

Niha dewlet dibêje ezê kurdan bidim mehkemê. Dewleta tîrık û hevalbendê wê dixwazin di kirase serokê neteweyî de gelê kurd, têkoşîna kurdan bidarizîne. Min bi tenê behsa yek wehşeta Con-tîrkan kir. Weki ku zarok dibêjin: Xwezi! Xwezi rojekê mehkemeyek were sazkarin û kevir, ax, av, deş, ciya daristan, heywanet û asîmanê welatê kurdan bi ziman bibin û hovîtiya Con-tîrkan bibêjin, hem şahid û hem jî dozvan bin di mehkemê de...

e-mail: hasan.kaya@usa-net

# Kewa biqiloç

**M**irovê nêçîrvan silav li civatê kir û bêdeng çû rûnişt. Civat geri-yabû û behsa nêçîrê vebû. Wî jî, cihê xwe xweş kir û dest bi gotinê kir:

—Sala çûyî ango par van çaxan, min rahişt çifteya xwe û ez çûm devê ne-walê, min kozika xwe çêkir ku tê de rû-nim. Dîna min dît kewekî got fir ji binê keviya min fîri. Min da dû. Çû xwe li nezarê Mişreqtewil danî. Baweriya we bi Xwedê be, mezinbûna wê ji gayê me Kejo zêdetir bû, ne kêm bû. Ez li pey ketim. Na welehi min ew li nav Hemîya Şêx Berhîm qeliband. Vir de wir de çû, çîma qiloçê wê di benekî de nealîqî. Ez gîhîstimê, belê min dê bi tenê nikaribûya wê bigirim. Ez derketim serê zi-yaretê min gazî gundî, cîranan kir û min got: “Du-sê werîsan bînin zû wê bifire!” Na welleh çar pênc xorten qîrase li ser hawara min hatin û me ew baş girêda û me ew serjêkir. Ez zêde serê we neêşînim, me goşte wê kir heft gewdêñ dimsê û me ew keland. Me ki-re milûd xelas nebû. Tiştên ku ji ber ma, me kire mexsûde, xelas nebû. Me kire qelî û şes-heft den mişt bûn, dîsa

xelas nebû. Heta duh-pêr jî me qeliya wê dixwar.

Cîranê wî xwe negirt û jê pîrsî, got:

—Gelo we hestiyêñ wê ci kir jê?

Nêçîrvan destê xwe hejand û got:

—Qey hûn di guhê gê (ga) de ne? Ma pira ku par van çaxan, li binya êş lê bû, ji ci çêbû?

## Hê Mezintir

Misto, hê nuh ji leşkeriyê hatibû. Sa-qoyê xwe diavêt nav milê xwe, paniya sola xwe dişikand û li nava gund digeriya. Gava ku diçû nav civatê jî, ji qu-reti silav nedikir. Tizbiya xwe dihejand û ji vî serî diçû wî serî.

Rojekê gundiyyê wî, yê qerfok ku navê wî Xelef bû, çû li ser Misto rawestiya û jê pîrsî, got:

—Misto, lawo tu dibê qey tu kesî ji te pê ve leşkerî nekiriye. Heqe tu pozê xwe bilind dikî û dimeşî. Gelo li leşkeriyê ritba te ci bû?

Berî ku Misto bersiv bide, xorhekî got:

—Qey onbaşî bû.

Misto xwe wekî dîkê elokan nepi-



xand û got:

—Hê mezintir.

Xelef got:

—Ê qey tu çawîş bûyî?

Misto got: Hê mezintir.

Bala civatê kişand û zilamên wê

derê li wan civiyan û her carê yekî ji

wan pîrsî û Misto jî bersiv da.

—Qey tu Yûzbaşî bûyî?

—Hê mezintir.

—Tu bînbâşî bûyî?

—Hê mezintir.

—Albay?

—Mezintir.

—General?

—Hê mezintir.

—Genel Kurmay?

—Mezintir, mezintir.

Xelef pir aciz bû û destê xwe bir ber çengoya Misto û gote wî:

—Qey tu înekbaşî bûyî? Ma weki din ci heye?

Misto destê xwe avêt ser milê Xelef û tepand û got:


—Halal be ji te re! Bi Xwedê te tê re derxist. Lewre serbazê min her gav ji min re digot; “înekbaşî!”

BERHEVKAR: ADAR JIYAN

## BI XELAT...

## XACEPIRSA BI XELAT (151)

## XACEPIRSA



### Bersiva Xacepirsa 149'an

Xacepirsa me bi xelat e.

Di 15 rojan de ci bersiv bigîhîjîn ber destê me, em dê wan binirxînîn û bi riya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmara me ya 151'ê Dîwana Feqiye Teyran ‘Ey avê av ‘e Jêrenot:

Ji bo ku bersiva we bê nir-xandin, divê hûn “Peyva Veşarı” di nava qutiyêñ li bin xacepîrsê de binivîsin û tevî navmîşana xwe ji me re bişînîn.


### DÎWANA

#### Feqiye Teyran

ey avê av

UNİVERSİTYA KÜNYE  
SERVİS İŞLETMESİ

Pênc kesen ku xelata 149'an Kaseta M. Şêxo 'Nesrin' qezenç kirine ev in: Egît Doğan / İskenderun, Zeynel Ekocagi / İzmir, Kejî Erdem / Riha, Cemal Asınç / Semsûr, Şahin Enç / Meleti.



PEYVA VEŞARI

60

1 2 3 4 5 6 7 8

Malbata Hemîd Çakırî:

# Hamîd şehîdê şarê kurd o

**I**talaya şiyayinê Serokê Giştî yê PKK Abdullah Öcalanî peyra polisanê dewleta tirk, HADEP'ê rû vardayin vişta. Polisan heveyê cayan de xeylê jî fâsihî girotibî xo het û jop û qelasî daybî ê faşistan dest û wastê HADEP'ian bi destê ê faşistan lînc bikerê. Nê vardayinanê winayînan de 2 HADEP'ijî ke namayînân Metin Yurtsever û Hamit Çakırî bi jop û qelasan kîşay. Nînan ra Metin Yurtsever banê HADEP'a Izmitî de jop û qelasanê Polisanê Îzmitî û faşistana, Hamit Çakır jî banê HADEP'a Amedî de kotegeanê polisanê tirk ra merdi. Embazé ma ROŞAN LEZGÎN malbata Hamid Çakırî ya pêdiyîn viraşt.

*Şima senî (çitor) pêhesiyay û gama ke sima şiyê nîweşxane, ewca de ci viraziya?*

■ Kekê Hamîd Çakırî Xelîl: Roja 18'ê aşme de saet hewtê şanî de telefonê ma ceniya. Telefon de yew embazê min ê kari, min ra vat: "Xelîl, di hebî polîsî nanyê verî min de, persê to kenê." Polîsî, navnişanê keyê min genê û yenê keyeyê min. Polisan ez kerda esparê ereba û min ra vat: "Yew dewijê to nîweşxaneyê de wo, ti belkî bisnasnê." Gama ma risay verê nîweşxanê dewletî yê Amed, bi ha-

mureka vêşî polis û timî ewca de bi. Ez şaş menda, tersawa. Înan ez berda merg. Ewca, min cenazê birayê xa dî. Cenaze viran bi û kincêyê berdibî yew ode. Mîdûrê Emniyeta Amed zî ewca de bi. Yê, min ra vat: "HADEP'ian eylem kerde, birayê to Hamid zî miyanê înan de biye. Ma birayê to ewca de tepiş. Zerê birayê to ra gunî şiya û merdo." Min tîfrazî ci kerd û min vat: "Birayê min weş û war bi, nîweşiyek yê dir çinebî. Şima o kişo." Polisan bi zordarî û bi tehdîtan bi min raporî dayi imzekerdir. Cenazê ma a şewe saet newin de, elelecele û bê wastenê ma ïnan berd goristanê Berê Mêrdin de defin kerd (tepiş).

*Şima eşkenê der barê rewşa cenaze de tayn agahî bidê ma. Gelo, cesed de cayê derban estbi?*

■ Waya Hamîd Çakırî Emine: Xera, ez birayê xo Xelîlî dima şiya nîweşxane. Gama ez risawa ser, hendî cenaze şitêne. Ez qîrawa înan ser û min vat: "Şima birayê min kiş û şima şîwenê zî. Ma hewce şitiş û kefenê şima niyê?" Înan min bi zor ewca ra vet tever. Ciye ke min dî, lewê ci-no cêrin qeleşnaye bi, milanê yê de herundê derban estbi û pey goşê yê de zî

reçê yew derbe estbi.


*Waya Emîne, ti eıkene ma rê qalê Hamîdî bikerî? O merdim ke seyin bi?*

■ Ma dewa Seyreke ya Pa-sûrî ra mi. Ma zilmê dewlete ver par keyê xo bar kerd û hamey Amed. Birayê min Hamîd, inşatan de emeletî kerdê. Na di aş-миye ke betal bi. Zer merdim ke maqûl û di hedê xo de bi. Şermek bi, pîlan rî bîhurmet û qican rî zi heskerdox bi. Roja ve-rîne zî şibi vere partî û hewna a-geyra keye. Min yê ra persa: "Çi ra ti nîşî partî? Yê zî mi ra vat:

"Ez şiya polisan derê partî giroti bi, ez neşikawa şorî zere?" Roja bîn hewna o û daya min ewca ra vêrenê. Partî ra vengê cepikan û dêran yêne, Hemîd daya min şîrawene (riştene) keye û o şino partî. Gane şîno ewca, labelê polîsê yê kişte vecanê.

*Gelo, şima doz kerda a, şima otopsiye-ka newe nîwasta?*

■ Xelîl: Baroyê Amed ra awûqatî hamey keyeyê ma, ma ra wekaletname girot.




Awuqatê baroyê Amedê namê ma ser doz akerê.

*Roja ke şinê şima kewto heta emroj e-leqê şarê Amed şima re seyin e?*

■ Şarî Amed û şarê may welatparêz û xosinasnaye pêro baw û birayê ma yê roja ke şinê ma kewte heta nika, her roj bi hezaran şarê ma yenê şinê ma het. Pêro zî ma ra vanê: "Ke şehîd ê keyê şima tenya niye, yê ma pêrin o." Bi rastî, êna yew zor zerê ma kena honik.

## TÎJ



LERZAN JANDÎL

## Rayê neweyî

**S**eye êno zanayene, vuriyen û averşyenê nê rojanê pênyiye her het ra tesîrê lecê kurdan û sere de dewleta tirkan û dewletanê bînan kerd.

Heto yew ra reaksiyonê dewleta tirkî naca de xîlê balkêş ê. Ganî nê rind biêrê diyene, rajañê amayenan de nînan ra der-san bicêrime. Reaksiyonê dînan ebi raştiye jî tam angorê dîroka dînan bî. Hovitiye û barbarîye, êriş û lînckerdene, kiştine, pêguretene, fesadiye, ruşvet, şantaj û durûtiye zê her tawî biye politikaya dewle-ta tirkan. Nê sosyal demokrat mend, ne

**Azadiya WELAT**

245 16 50 - 251 79 37 - 251 90 13  
FAX: 251 95 85

■ Xwedî (İmtiyaz Sahibi)  
M. NURI KARAKOYUN  
  
■ Yönetim Yeri:  
İstiklal cad. Asmalı Mescit sok. 35/37 No:308  
Beyoğlu/Istanbul  
TEL: (0 212)

İstiklal cad. Asmalı Mescit sok. 35/37 No:308  
Beyoğlu/Istanbul  
TEL: (0 212)

■ Gerînendeyê Giştî yê Weşanê  
(Genel Yayın Yönetmeni)

SAMÎ TAN

■ Berpîrsê Karên Nîvîsaran

(Yazî İşleri Müdürü)

M. SALIH TAŞKESEN

■ ÇAPXANE

Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.

îslamî mend, ne çep mend, ne jî raşt mend. Ebi qeyde zafêriya ciyaye ebi propogandaya dewlette jî hemverê "Kürt"î biye yew. Béguman na nêna a manaye ke qesede tirkî hetê kurda nêkerd. Nê, la belê vengê nînan xîlê qels yejiya. Seke êno zanayene nê bi xo jî şenik ê. La belê zafêriya şarê tirkanê ke medya tirkan de asêne, vengê xo vejiyêne, pêro piya ebi verganê gewran hemverê kurdan lîncê organîze kerdi.

La belê vuriyena tewr biqedre a wa ke meseleya şarê ma (her ciqa ke ver hetê

şaran û dewletanê bînan ra zanayene jî hem heto yew ro tam rojeva dewletan de nişte ro û seba çareserkerdena problemanê şarê ma rayê politikî bî ra û hem jî şarê ma qewet, fedekarî û yewtiya xo musnê şaranê bînan. Sebeta ke zaf areste wo, tesîr û qedrê naye ser ro pêwîst niyo mordem derg û dila binivisno. Çimke her mordemo ke vîneno heşneno û waneno, nê çiyan ra haydar o.

Heto bîn ra tesîrê na vurnayena bîne a wa ke dîroka şarê ma de raya yewîne mezg û zeryabela şarê ma de heşê yewtiye ne tenya vatene de, la belê raştiye de jî ca guret. Ganî mordem na yewe bîvîno, şert û şurtanê naye jî biyaro ca. Nê çik ê? Her çî ra ver ganî êndî kesê ma, wendox, karker, dewij, roşnâvîr, politikavan, esnaf û şenikianê ma na game seba mezg û heş de yewbiyena kurdan, seba demokratkerdena têkiliyanê miyanê şarê ma bixebetnê. Ganî her kes êndî heşê xo biyare şarê xo. Nêweşyanê rojanê verî ra derbaz bê. Seba çiyanê newiyan rakerde bê û her çî teyna siya û sıpê mevînê. Seba aştiya miyanê şarê ma de, kesanê ma de, organizasyon û şenikianê ma de gamanê gîrsan bi cesaret

berzê. Naye ra kes zerar nêkeno, la belê şarê ma karê keno. Nê çiye ke verde jî amêne vatene, ganî ewro ra tepiya, vatenebiyene ra biveciyê û bibê pratîk.

Ma ganî xo vîra mekerîme. Tawo ke Xalit Begê Cibiriyan Erzerom ra berd Bidîlî kes çînê bî, ke ê raye ra raxellesno. Sêy Riza ke Erzingan ra berd Xarpêt kes çînê bî ke ê raxellesno yan jî dê dime şoro Xarpêt. Qasimlo ke Viyana de amê kiştene, wun-ciya kes çînê bî ere ci wayir biveciya. Ma teyna anê hîrê biyenanê kanan û biyena pênyiye dîroka kurdan de bidêro têver, raştiya ma zaf zelal vîneno. Ma dîroke de ci gamî eşte, ma ciqa avêr şîme, ciqa tepiya mendîme, ciqa bîme yew û ciqa bîme vîla.

Her çî ra ver jî têverşanitena nê biyena seba analîzkerdena qonaxê şarê mayê nê demî kar û gureyê manê rojanê verê ma de musnena ma. Bawerî û hêviya mi, waştena mi a wa ke her kesê kurdi na der-heq de karo ke para dê kuno, baro ke para dê kuno ebi cidiyet bicêro û seba welatê do azad, xoser û demokratik bixebeziyo.

■ Yayın Koordinasyonu:  
Gündem Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti.

■ BELAVKIRIN  
BİRYAY Dağıtım

■ NIVİSGEHÎN TEKİLİYÊ

(İrtibat büroları)

■ Amed:

Tel: 0 (412) 223 34 83

■ Mersin

Tel: 0 (324) 233 83 96

■ İzmîr  
Tel-fax: 0 (232) 425 37 02

■ Edene

Tel: 0 (322) 351 42 78

■ Munchen:

(Nûnerî Giştî yê Ewrûpayê)

Mahmut Gergerli

Tel: 49 871 672 29

Fax: 49 871 670 815

■ Swiss:

Ihsan Kurt

Tel-fax

41 21 652 76 07

■ Hollanda:

S. A. Fewzi

Tel-Fax: 31 10 48 555 43

■ Suriye:

Jana Seyda

Helim Yusiv

Piştî 20 salan şahideki qirkirina Mereşê:

# An emê bihatana kuştin an emê bişewitiyana

Hêzên dewletê ji faşîstan re digot ku kî komûnîstekî, cudaxwazekî û elewiyekî bikuje çawa ku pênc caran here hecê û vegere dibe xwedî xêr. Dewletê bi hinceta pevçûna di navbera polisan û gel de (!) hêzên xwe ji herêma Maraşê vekişandin.

**L**i gorî lêkolîn û légerînê zanîsti şeniyê Bajarê Mereşê 6 hezar sal berî zayinê derbasî jîjiana dêmanî bûye. Maraş di dîrokê de ketiye bin destê gelek dewlet û hêzan. Mirov dikare wan hêzan wiha rêt bike: Gurgum, Hattî (Hittî), Mitanî, Asûr, Ûrartû, Pers, Makedonya, Bîzans, Sasanî, Roma, Merwanî, Osmanî û Komara Tirk. Rewşa kozmopolit a Mereşê ji vê çand û dîroka kevnar tê. Li gorî hin lêkolîneran Mereş navekî kurdi ye. Vê dîtina xwe ji li Mereşê bi pirbûna marêñ reş ve girê didin

Mereş ji aliye erdnîgarî ve di navbera sinorê Tirkîye û Kurdistanê de dimîne. Ev taybetiyê bajêr ên erdnîgarî, dîrokî û civakî Mereşê ji bo Komara Tirk gîringitir dîkin.

Mereş di dîroka nêzik de beramberi qirkirineke nedîti ma. 20 sal di ser vê qirkirinê re derbas bûne lê bandora wê didome û diyar e ku dê bi dehan salan ji bidome. Qetliama Maraşê bêyi sedemîn dîrokî, civakî û bûyerên ku di salen 80'yi de rû dane, ne gengaz e ku bi awayekî baş bê nirxandin.

Bi salen 1980'yi re li Tirkîyeyê tevgerên çepgir kemîlin, li Kurdistanê ji PKK'ê cirûskên Têkoşîna Rizgariya Neteweya Kurdistanê pêxistin. Kongreya Yekem vê yekê berbiçavtir dike. Karker, xwendekar, kedkar bi kurtayî di civakê de her cure mirov rabûn ser piyan. Muxalefeta civakî rejîm hejand. Berî wê, dewletê digot qey Tevgera Azadiyê û tevgera civakî di bin kontrola wê de ye. Pergalê ev bûyer ji bo windakirina xwe wekî despêkeke mezin didit. Lewma ji faşîzmê çavê endamê xwe li provakasyon û dek û dolaban digerand. Ü herêma Mereşê ji bo vê yekê geleki guncaw bû. Ji ber ku li Mereşê elewiyêñ tirk û kurd, sunî bi sedan salan bi hev re jiyan. Gelê bajêr di Şerê Cihanê yê Yekem de ji li dijî împeryalistan berxwedaneke mezin nişan daye. Lê sistemê ev cudatiyêñ di nava gel û bawerîyan de bi awayekî nîjadperest bi kar anî û ev yek kire hinceta qirkirinê.

## Pêxwas li ser kar in

Dewleta nehêni amadekariyêñ xwe qedandibûn. Li benda işaretekê bû û ew cirûsk ji aliye faşîstên di bin kontrola



Wêne ji pirtûka Sessiz Tanik

wê de hatin pêxistin. Roja 19'ê berfanbara 1978'an faşîstê bi navê Ökkes (Kenger) Şendiller ku iro mebûsê Parlamento Tirk e, bombeyek avête Sînemaya Çiçekê. Li sînemayê filmekî li dijî Yekîtiya Sovyetê dilist. Temâşevanên film ji bi piranî rastgir û faşist bûn. Bi dû wê re faşîstan got elewî, cudaxwaz (kurd) û komûnîstan ev çalakî pêk aniye. Piştî vê qehweyeke ku bi piranî kurdên elewî û çepgir diçûnê, hate bombekirin. Roja 21'ê berfanbarê du mamosteyêndamê TÖBDER'ê (Komîleya Yekîtiya Mamosteyê Tirkîyeyê) hatin kuştin. Kesênu ku ji bo merasîma cenazeyê van mamosteyan kom bûbûn, ji aliye faşîstan ve hatin gulebarankirin.

## Hêzên Dewletê ji bajêr vedikişin

Hêzên dewletê ji faşîstan re digot ku kî komûnîstekî, cudaxwazekî û elewiyekî bikuje çawa ku pênc caran here hecê û vegere dibe xwedî xêr. Dewletê bi hinceta pevçûna di navbera polisan û gel de (!) hêzên xwe ji herêma Maraşê da vekişandin. Dewletê tu mudaxale nekir. Faşîstên derdora Maraşê di bin kontrola dewletê de hatin Maraşê. Faşîstan êrîşen xwe bi piranî li Yörükselim, Serintepe, Mağaralı û Yenimahale pêk anîn. Büyerek balkêş ji ev e; berî plana qirêj faşîstên sivil xwe wekî xe-

batkarên belediyeyê dabûn nasin û ji bo ku bi hêsanî bibînin malen elewî û kurdan bi işaret X işaret kiribûn. Ew malen işaretkirî yek bi yek hatin şewitandin, mirovên di van malan de rûdiniştin hatin qirkirin. Ev komkuji heta 25'ê mehê domiya. Li gorî agahiyêñ dewletê yên fermî 112 kes hatin kuştin, 210 mal, 70 kargeh hatin şewitandin. Lê mirovên di wê demê de jiyane dibêjin ev hejmar ne ji sisêyan yekê wê ye ji.

Piştî komkujiyê ji sedî 80'ye nifusa kurdên elewî û mirovên pêşverê koç kirin. Xuya dibe ku yek ji armancêñ qirkirinê ji ev bû.

Mirovek bi navê Mehmet Özdemir ku xwe wekî şahidê komkujiya Mereşê yê yekem dinirxîne, dîtinê xwe wiha tîne zimê: "Hindik mabû ez ji bihata ma kuştin. Ew, rojêñ pir reş bûn ji ber ku kujeran reşahî dîbarand. Li gorî Mehmet Özdemir sê armancêñ qirkirinê yên sereke hebûn. Yek; rawestandina Tevgera Azadiyê û hilweşandina muxalefeta civakî, du; amadekariya faşîzma 12'ye Rezberê, sê; kuştin û koçberkirina mirovên pêşverû.

Em ê gotinê Özdemir bêşirove bidin: Ez û şes hevalen xwe di kargehekê de bûn. Bi sedan faşist ku di destê wan de keleş, dar û şotê (bîdon) benzînê hebûn. Berê xwe dane avahiya ku em tê de bûn. Avahiyê çend partiyêñ siyasi

û kargeh şewitandin. Ji mejbûri em kargehê derketin, em ketin maleki Xwediye malê dadger bû. Pêşiyê ne west me bihewîne, lê em bi zorê ket hundir. Li hundirê avahiyê agir hû (gur) bûbû. Heta derence ji dişewitîn An em ê bihatana kuştin an ji em ê bişewitiyana. Me malbata dadger ji hundir derxist û em ji avahiyê derketin Piştî vê, di wê aloziyê de min hevalê xwe winda kirin. Her der bûbû toz i dûxan. Bombe, xwîn, zarokên birînlaşen parçebûyî... Min xwe avete dexî xwediye otelekê. Pêşî li simbelîn in nêri, ez qewirandim. Min xwest ku xwe li avahiya adliyeyê ji wan kujer bifilitinim, lê leşkeren li ber adliyeyê doxa çekan li min xist û ez di xwînê de gepiçandim."

## Min xwe li dînîtiyê danî

Dema Mehmet Özdemir qala van bûyeran dikir, diricifi û hêstrî ji çavê wî dibariyan. Özdemir di vê psikolojiyê de wiha domand: "Li kolanekê û bi sedan faşist beranberi hev man Kêliya ku em hatin hemberi hev, bûye reke ku min di pirtûkê de xwendibate bîra min. Di wê pirtûkê de şorey gerek ji bo ku ji dijimin xelas bibe, xwe li dînîtiyê dafine. Min ji di wê demê de xwe li dînîtiyê danî. Ez carinan rûdînitim carinan radibûm. Bi vî awayî min komika çekdar li paş xwe hişt. Wan ji van tevgerên min bawer kir. Bi vî rengî ez hetanî istasyona trêne meşiyam. Lê dewletê bi zaneyî têkiliyên Mereşê bi derdorêñ wê re biribû. Ez ê biçiyam Navçeya Kurdoxlu (Türkoğlu). Mînîbûsek li min sekinî. Ajotkarê mînîbûsek dizanibû ku li wê navçeyê bi piranî elewiyêñ tirk û kurd dijîn. Ji min re got "Tu yê ji bo ci herî vê navçeyê? Min ji got ez ê herim, hevalê xwe yê leşkerîye bibînim." Dema ez peya bûm, min xwest ku ez heqê rî bidimê. Ji min re got; "Yok kardaş bugün komünüstlerin hepsini gebertecigiz, bugün bizim bayramımız ondan dolayı bugün para alımıyoruz" (Na bira iro em ê hemî komünîstan bisekitînîn, iro cejna me ye Lewma ji em iro pereyan nastînîn.)

EMİN BOZAN